



## Article

International Journal of Kurdish Studies

(ISSN:2149-2751)

5 (1), pp. 11 – 40

<http://www.ijoks.com>

## Newşên Yekemîn Yên Kurd Li Elmanya: Destpêk

Avdo KARATAŞ<sup>1</sup>

Received: Dec 2, 2018 Reviewed: Dec 18, 2018 Accepted: Dec 22, 2018

## First Kurdish Generations In Germany: Introduction

## Abstract

The most neglected issue when examining the phenomenon of migration is the first generations issue. The first generations are, of course, the leading actors in migration trends. Despite playing an important role in the socialization of immigrants and the formation of the perception of immigrants, first generations have largely been neglected in migration research, and destination countries have typically been more interested in new generations.

When the Kurdish immigration phenomenon is objectively observed, it is clear that there is much waiting to be examined. In general, the first generation of Kurdish immigrants are neglected in the research. There are two “first generations” among Kurdish immigrants: “Worker first generation” and “refugee first generation.” This makes the study of the first generation of Kurdish immigrants even more important. In order to draw attention to this neglected issue, a biographical survey was conducted with six immigrants from the first generation and interpreted under the category of “the worker and the refugee first generation.” It sought to interpret four independent sections from the obtained data. This article was prepared as the first chapter and serves as the introduction for the first generations research. The purpose of this introduction is to establish a framework for the grading, concept, description, methods and theories about the first generation immigrants. The following three sections not included in this journal are about the following: “Problems of the first generation,” “new phenomena occurring in the Kurdish family in the diaspora,” and “the identities of the first generation.”

**Key words:** Kurdish migration, First generation of Kurds in Germany, First generation workers, First generation politicians

## Puxte

Di nav mijarên koçberiyê de ya herî tê îhmal kirin, mijara newşên yekemîn e. Her çiqas ev newş aktorên sereke yên koçberiyê, yên sosyâlîzekirina newşên nu, runîştina îmajê koçberan û hwd. in, dîse jî di lêkolînan de pir tîn îhmal kirin û dewletên koçgirt behtir ramana xwe diberdin ser newşên nu. Wekî mirov bi nerîneke objektîf li koçberên Kurd dinêre, peyt dike ku mijara koçberên Kurd bi tewahî li benda lêkolînkirinê ye. Bi gelemperî newşa yekemîn ya Kurd di koçberiyê de bi tewahî tê îhmal kirin. Anko li cem koçberên Kurd hem newşeke yekemîn ya karker hem jî yeke penaber heye, mijara newşên yekemîn wateyek pircure û muhîm e. Ji bona ku ev

<sup>1</sup> Ph.D Can., Freiburg University, Germany, E-mail: avdokaratas2@gmail.com,

**ORCID NO** : <https://orcid.org/0000-0002-1854-2591>

mijara hatî îhmalkirin, hinekî balê bixşîne, lêkolîneke biyografîk bi şeş kesên ji newşên yekemîn re hatiye kirin û di bin kategoriyên newşa yekemîn ya karker û ya penaber de hatiye şîrovekirin. Li ser wan daneyan hatiye plankirin ku çar mijarên sereke werin şîrovekirin. Ev nivîs wek mijara yekemîn hatiye amadekirin û destpêka mijara newşên yekemîn e. Armanca vê destpêkê ev e ku çarçoveyêke têbînî, têgînî, pênasî, rêbaz û teorîkî ya mijara newşa yekemîn ya koçber rave bike. Xebata didoyê li ser mijara „Pirsgirekên newşên yekemîn“ e. Yan sisê li ser „Nûrudanên malbata kurd ya diyasporayê“ ye û ya çarê li ser „Nasnameya newşên yekemîn“ e.

**Têgînên sereke:** Koçberiya Kurdan, newşên yekemîn yên Kurdan li Elmanya, newşa yekemîn ya karker, newwa yekemîn ya penaber

### **Recommended citation:**

Karataş, A. (2019). Newşên Yekemîn Yên Kurd Li Elmanya: Destpêk. *International Journal of Kurdish Studies* 5 (1), 11 – 40 DOI: [10.21600/ijoks.516471](https://doi.org/10.21600/ijoks.516471)

### **Destpêk**

Di dîroka gelê Kurd de kêma fenomen hene ku qasî koçberiyê bandora xwe gihandine demê me. Bi gelemperî bûyerên di dîrokê de ru dayî, bi pelege koçberiyê bidawî hatiye. Îro bi dehan enklav û civatên Kurd ji Asyaya Navîn, heta Ewropa ji Japonya heta Amerîqa, ji Sibîrya heta Avustîralya li cureyên deverên cîhane hene û ev enklav bi gelemperî di encama koçberiya neîradî de hatine avakirin. Ji bona vê yekê îro nezikî nivê hijmara Kurdan ne di welatê xwe de jiyan dikin (bnr. Kizilhan 2013). Wekî guftûgoyek li ser formasyona civakên Kurd were kirin, mijara koçberiyê mijarek sereke ye. Ev çiqas fenomenek mezin ya Kurdan jî be, eleqeya lêkolîna vê mijarê jî wulkasî kêma e. Anko lêkolînên zanyarî li ser vê mijarê kêma in, hem mijar naye naskirin, hem jî mirov nikare derheqê vê mijarê de agahiyên bibawer hilbigre û şîrove bike. Gelo çima ev mijara gir û muhîm bala zanyaran nakişêne?

Her çiqas Kurd bi gelemperî kêma dibin mijara lêkolînan, mijara newş(ên) yekemîn hê kemtir tê dîtîn. Xemsariya li ser mijara newşên yekemîn yên koçber pirsek gelemperî ye û ne tenê di nav koçberên Kurd de lê di yên gelên din jî tê îhmalkirin. Lê belê ev xemsariya dijî newşa yekemîn de, di nivê salên 1980yî de kêma bû. Sedema vê alaka nu jî ev bû, anko ev kes pîr (jin) û kal (mêr) bûn û alaka sektorên ciharam (mala pîrûkalan) û xwelêxweyîkirinê girtin ser xwe (Spohn 2002: 46). Ev kes bûne kiryarên (muşterî) van saziyan. Ji bona xweyîkirin û lêmeyzandina wan mirovan alaqaqeyê lêkolînê li ser wan rû da. Dîse jî agahiyên zanyarî bi gelemperî li ser newşên yekemîn kêma in û li ser yên Kurd wek tune ne.

Di koçberiya Elmanya de di mijara giyanî de lêkolîneke rêber ji aliyê Prof. Kizilhan ve di sala 1995' de hatiye çapkirin. Ev xebat bi bingeh û bergeha xwe ve di zimanê Elmanî de wek xebata yekemîn û tenêmanî ya li ser mijara pirsgirekên giyanî yên koçberên Kurd de ye. Xebata Kizilhan jî li ser pirsgirekên gelemperî yên koçberên Kurd e û bi taybetî ne li ser newşên yekemîn e. Ji bilî vê lêkolînê jî, tuye ku bi taybetî li ser pirsgirekên newşên yekemîn yên Kurd dirawestin, tune ne. Ev mijar vê di xebata li ser „Pirsgirekên Newşên Yekemîn“ de bi berfireh were şîrovekirin. Her çiqas mirov bi

bingiha teorî û literatur hewl bide jî, anko lêkolîn pir kêr in, mirov nikare çarçoveyeke têgihîştbar li ser newşên yekemîn derxê holê.

Hêjayê gotinê ye ku newşa yekemîn ji aliyekî ve wek aktorên sereke yê koçberiya Kurd û hilgirdanên çand, ziman û dîroka Kurd ya nujên in û ji aliyekî din ve mîsogeriya nasnameya Kurd li cem newşên nu ne. Lê belê taybetmendiya newşa yekemîn bi gelemperî wek nerenî tîn dîtin. Anko ev newş bandorê li newşên nu dike, pergala sereke hewl dide ku wan ji bona „biryardana takekesî ya jiyancîhanî“ ji newşa nu dur bixe. Anko kesên pîrûkal ji bona masrafa xwelîxweyîkirina wan wek „pîrsgirek“ tîn dîtin, bi gelemperî di raya giştî de naye dîtin.

Ev newş bi wan taybetmendiya xwe, xwe ji newşên din cuda dike û pewist e ku ev newş bi her alî ve were lêkolînkirin.

Li Elmanya du komên newşên yekemîn yê Kurd hene. Ev herdu komên newşan hem di dem, rewş, sedem û armancên cuda cuda de hatine, hem jî bi armancên cuda li Elmanya mane. Ji bona vê yekê pewist e, ji hev werin cudakirin. Yek jê koma newşa yekemîn ya bi Tirkan re ji sala 1961'î û vir de ji bona kar û ya duyemîn ya bi gelemperî di salên 1980'î de ji bona *parastina siyasî* hatine Elmanyayê ye. Di vê xebatê de koma yekemîn wek *newşa yekemîn ya karker* û ya duyemîn wek *newşa yekemîn ya penaber* hatine pênaskirin. Hijmara yê karker di salên 1990'an de rawestiha ye, lê belê hijmar û rêjeya yê penaber herî diçê zêde dibe. Anko îstatîstîkên taybet tune ne, mirov nikare ne li ser hijmara wan, ne jî li ser sedemên koçberiyên wan agahiyên rast bigre. Pirsên wek; gelo koçberên Kurd yê siyasî an jî yê karker zêdetir in, hijmar û rêjeya Kurdên ji parçeyên Kurdistanê çiqas in, çiqas bûne hemwelatîyê Elman, çiqas wegerihana û hwd. nikarin bi îstatîstîkên bibawer werin analîz kirin.

Tiştê mirov zane ev e ku di serî de, bilî koçberên elît yê ji bona karên dîplomasî û xwendina bilind hatî, heta salên 1960'yan koma herî mezin ji Kurdistanê Başur bûn, bi peyama karkeran di navbera Elmanya û Tirkî de hijmara koçberên karker ji Kurdistanê Bakur û Tirkîyê zêde bûn û bi salên 1990'î ve hijmara Kurdên penaber ji Kurdistanê Bakur û bi şerê Îraqê re bi sala 2003'an ve hijmara Kurdên penaber yê Kurdistanê Başur, di salên 2014'an re û bi gelemperî bi rudana DAIŞê re hijmara Kurdên penaber yê Rojava û Başur zêde bûn. Di wan cureyên koçberiyê de hijmara mirovên ciwan her demî behtir bû. Li gora rêzê her yek ji wan pêlên koçberiyê newşa xwe ya yekemîn ava dike. Wekî mirov wan pêlên koçberiyê caxvdêr dike, kare peyt bike ku newşa yekemîn ya bi rêya kar ya piştî sala 1961'î hatî û ya siyasî ya piştî 1985'î de hatî bi *çendahi* (Qualifizierung) û *çawahiya* (Quantifizierung) xwe ve ji yê din behtir û bi heztir in.

Salên 1990'an, di koçberiya Kurd de demek pewist e. Ev dem di gelek xalan de ji bona mijara koçberiya Kurd, muhîm e. Xala yekemîn ev e ku di mijara newş de „guhertinek“ derketiyê holê. Xala duyemîn jî ev e ku „diyasporaya modern ya Kurdan“ di jîhanê de cihê xwe girt. Ev newşa di vî demî de di warê koçberiya neîradî de hatî Ewropa, diyaspora Kurd ya modern afirand (bnr. Karatas 2018).

Ev newş ne ji komên hurik yê rewşenbîran, xwendewanan an jî karzasan pêk dihat, bi gelemperiya xwe mirovên jî çina bin û hinek jî ji ya navîn bûn. Çiqas dîroka koçberiya Kurd pir kevin jî be, bi wateyek modern, diyasporaya Kurd di vê demê de ji diyaspora rewşenbîrên Kurd burî û xwe bi kutleyên mezin yê polîtîk ve da naskirin û cîhan bi diyaspora Kurd hesiya. Ji bona vê yekê ji vî demî ve koçberiya Kurd gelemperî bi ramana siyasî tê dîtin û lêkolînkirin (bnr. Ammann 1997, 2001; Skubsch 2002; Eliassie 2012; Khayati 2009; Baser 2013; Alinia 2004, 2007; Bredtmann 2011). Ji bona vê yeke ev newş, ji hemu newşên din yê Kurd behtir hatine çavdêr<sup>2</sup> kirin.

Elmanya di diyaspora Kurd de cihekî taybet digre. Îro civata Kurd li Elmanya ji milyonekî zêdetir e. Wekî mirov li vê civatê û nivîsên li ser wan dinêre, dibîne ku pirsîgîrêkên vê civatê yê çandî, civakî, malbatî, newşî, siyasî û hwd. hemu li benda çareserkirine ne. Herî dema dibûre, mirov pîrûkal dibin û newşên nu têne dinê û mezin dibin. Bi vî alî pirsîgîrêkên wan mirovan jî gir, kur û zehmet dibin û wusa xwiyadike ku tu hewldanên ji bona pêşeroja wan mirovan yê ku xwe li wan bikin xweyî, tune ne.

Peyva *newşên koçber* (Migrantengeneration) di lêkolînan de têgîneyeke ne bêpirsîgîrêk e. Di heman warî de cudakirina newşan jî pirsîgîrêk din e. Ev pirsîgîrêk, weke li jêr were guftûkirin, di serî de ji pênasî û kategorîzekirina civaka koçgirt tê. Ji bona vê yekê pewist e ku ev têgîn werin pênaskirin. Têgîna *newşa yekemîn ya koçber* hemen hemen di literatûra Elman de ji erdê rabuye, lê belê ji aliyê saziyên fermî ve tê bikaranîn û di cureyekî balkeş de tê pênaskirin. Lê belê ev têgîn ji bona şîroveya Kurdan pir giring e û pewist e were pênaskirin. Pênasî heman demî ji bona pênasiyên newşên din jî pewist e.

Civata Kurd li Elmanya ji bilî çalakîyên siyasî pir li ber çavan, yanî di nava *nêvenga raya giştî* (Öffentlichkeitsbereichen) de xwiya nake. Civata Kurd xwe li derveyî „*cihên dîtbariyê*“<sup>3</sup> digrin. Ne mizgefta ava dikin ku guftûgoyan li ser *îslamîkirina Ewropa* begrin ser xwe, ne jî bi ala neteweyî derdikevin kolanan ku guftûgoyên *civatên paralel* derxin holê. Di raya giştî de berberiya çanda Elmanî nakin û sererkiya Elman nasdikin: Li gora gelemperiyê Kurdên koçber, Elmanya dewleta Elmana ye (bnr. Karataş 2018).

Ji bona ku rewşa newşa yekemîn ya karker û ya penaber bi nezikî werin guftûgo kirin, bi sê jîn û sê mêran re şeş *xebatên biyografîk* hatine kirin. Nîvê van mirovan ji *newşa yekemîn ya karker* in û nîvê din jî ji ya *penaber* in. Armanca vê xebatê ev e ku ev mijara her demî ser guhan re hatiyê avetin û jibîrkirin, di nav derdora rêbazên zanyarî de were şiyarkirin, pêwendî li ser van newşan were danîn,

<sup>2</sup> Nivîskarê vê gotarê dijî kurtkirina peyvên kurdî de ye. Pir nivîskar gelek peyvên li gora bilêvkirina (Artikulation) dinivîsin. Wek mînak; roj wek „ro“, çax wek „çav“, mirhov wek „mîrov“ û hwd. Lê belê wekî kovar bilevkirina peyvên wek rêz deyne, nivîskar bêgav dimêne, li gora rêza kovarê here. Ji bona vê yekê di vê gotarê de hinek peyv ne li gora nivîskar, lê li gora rêzên kovarê hatine nivîsandin.

<sup>3</sup> Cihên dîtbariyê di vê xebatê de wek rewşeke raya giştî hatiye pênaskirin. Nêvenga civakî ya civakên pêşketî ya bi gelemperî ji çanda netewî dur e, piçandî û cihê jiyancîhandî ye, wek cihên dîtbariyê hatiye pênaskirin. Ev nêveng bi gelemperî cihê xeritaniyê (Konsum) ye.

rewşa wan di raya giştî de were guftûgokirin û pêwendiyek ji bona pirsgirekên wan were danîn û çareserî ji bona pirsgirekên wan werin xwestin.

Di destpêkê de li ser wan daneyên biyografîk çar xebat hatine plankirin ku çarçoveya jiyancîhana wan mirovan ya aktuel bi avayekî zanyarî bidin xwiyakirin. Ev nivîs wek xebata yekemîn hatiye amadekirin. Xebata didoyê li ser „Pirsgirekên newşên yekemîn“ e. Xebata sisê li ser „Nûrudanên malbata kurd ya diyasporayê“ ye. Ya çarê li ser „Nasnameya newşên yekemîn“ e.

Pewistiya lêkolînê li ser newşên yekemîn ev e ku bêtir newşên yekemîn newin têgihiştin, ne pêkan e ku rewşa Kurdan li diyaspora were şîrovekirin. Koçberiyê mijara newş ji bona civatên Kurd bi avekî eşkere derxistiye holê. Lê belê anko mijara newş di civatên Kurdan de nehatiye guftûgokirin, pirsgirekên pênasî, kategori, jihev cudabûn û hwd. yê mijara newş hê li benda guftûgokirine ne. Koçberiya Kurd taybetmendiyên xwe hene û pewist e ku di nav taybetmendiya şert û mercên xwe de were lêkolîn û şîrovekirin.

**Çarçoveya Rêbaz û Teoriyê**

Daneyên di her çar xebatên de werin şîrovekirin, xwe li ser bingeha daneyên xebata şeş biyografiyan digre. Lê belê ji sala 2003’yan ve dane li ser civata Kurd li Elmanya bi rêbazên hevpeywîn, xebatên biyografîk û çaxwêrî li gora rêbazek sistematîk tî tomarkirin û li gora mijarên cure tî kategorikirin û arşivkirin. Ev daneyên mijarên cure cure bi gelemperî di bin azineyên „Lêkolîna Civakî Ya Kualitatîf“ (Qualitative Sozialforschung) ya Mayring (1990) û „Hevpeywîna Naratîf“ (Narrative Interview) ya Bernart & Krapp (2005) de tî tomarkirin û arşivkirin.

Her mijara tî lêkolînkirin, di kategoriyekî de li gora kodan (Kodierung) (Mayrings 2015: 103) tî qeydkirin<sup>4</sup>. Her koda di daneyên xwe de tîr bibe (Sättigung), wek mijarek bi serê xwe tî şîrovekirin û amadekirin. Daneyên ji bona xebatekî tî şîrovekirin, bi gelemperî li gora „Şîrovekirina Naverokê Ya Kualitatîf“ (Qualitative Inhaltsanalyse) (bnr. Mayring 2015) tî kirin.

Ev daneyên di her çar xebatan de werin bikar anîn, bi gelemperî ji wan şeş biyografiyên li jêr hatine tomarkirin.

<b>Nav</b>	<b>Zayend</b>	<b>Temen</b>	<b>Sedema</b>	<b>Sala</b>	<b>Welat</b>	<b>Hijmara</b>	<b>Hijmara</b>	<b>Revşa</b>
------------	---------------	--------------	---------------	-------------	--------------	----------------	----------------	--------------

<sup>4</sup> Kodkirin rêbazeke şîrovekirina daneyên hatine tomarkirine. Ev rêbaz di lêkolînê nêvengî yê çandî û civakî de beşek ya rêbaza lêkolîna zanyariyên civakî ye. Daneyên wek tekst, wêne, tîbînî, amurên sembolîk li gora pirsê lêkolînê tî şîrovekirin. Bi vî alî giriftiya daneyan tî kêmkirin. Mirov kare daneyên her mijarê wek komekî li ber çavê xwe hebe û wekî pewist be, her kodekî bi binkodan hurtir bike. Di pevajo ya lêkolînê de her dane li cem koda xwe tî nîşankirin û wekî daneyan xwe dubarekirin, tî wê wateye ku tîrbûn (Sättigung) çebuye. Di rêze de mirov karê her pirsê wek kodekî bikar bêne û bersivên xwe bi vê pirsê ve girêdidin, li cem vê kode lîste bike.

			<b>Hatinê</b>	<b>Koçberiyê</b>		<b>zarokan</b>	<b>Nevîyan</b>	<b>karûber ya Niha</b>
Ibrahim	Mêr	1950	Kar	1979	Maraş	5	9	Teqawît
Leyla	Jin	1949	Kar	1971	Maraş	8	18	Teqewît
Hasan	mêr	1955	Kar	1972	Semsur	7	13	Teqawît
Mence	Jin	1969	Penaberî	1990	Merdin	11	5	Mal
Ali	mêr	1968	Penaberî	1989	Dersim	3	1	Dikan
Memet	mêr	1972	Penaberî	1991	Şirnak	6	9	Doner

**Şema:** Mirovên biyografiya wan hatiye amadekirin<sup>5</sup>:

Ev kes hemu ji Kurdistanê Bakur an ji Tirkiyê hatine. Newsê karker newşa çarê, newşa penaber newşa sêyê mezin dike. Kes ji wan bi dêûbavên xwe re nehatine û dêûbavên xwe neanîne. Ev kes hemu li kantona Baden-Württemberg dijîn. Di pêjirandina kesên agahdar de ne ol, zarava an îdeolojî, lê herem û giyan wek krîter hatine dîtin. Bi rastî ev kemasiyêke lêkolînê ye, lê belê anko xebatên biyografîk pir dem û cih dixwazin, nê pêkan e ku bi gelek mirovan re werin kirin. Xebat vê kêmasiyê li ber çav digre û ji bona vê yekê tu îddiaya xebatê ya „gelempêrkirina vegotinan“ tune ye. Armanç ev e, vê mijarê ji bona lêkolînên pêşerojê nujen bike.

### **Teoriyên Li Ser Newşa Yekemîn Ya Koçber**

Di mijara zanyarî de “gotinên bibawer” di warê rêbaziye de tên gotin. Her rêbaz xweyî têgîniyên xwe ne. Lê belê pewist e, were gotin ku her têbînî, pênasiyek e û her pênasiya zanyarî, civakî, siyasî bi “ramana sereke” ya pergala civakê tê afirandin. Yê pênas dike, xweyî hêz e. Yanî ne zanyarî ne rêbaz ne jî têbînî nikarin bê binyadên hikumdariyê bibin yê sereke. Ji bona vê yekê pewist e, her demî zanyarî, rêbaz û têgînî di serî de di bêjînga “perspektiva rexneyî” re werin şîrove kirin. Di serde jî pewist e ku rêbaz û têgîneyên ji aliyê elîtên civakê ve wek „kevin“, „nerast“ an jî „bêbawer“ werin dîtin, behtir balê bikêşênin ser xwe û werin şîrovekirin.

Mirov kare di vî warî de li Elmanya du helwestbazan (Ansatz) wek mînak bide. Ev herdu helwestbaz li ser û li gora rewşa koçberên biyanî hatibûn afirandin. Ev herdu helwestbaz, di bingîha xwe de koçberan wek kutleyek yanî bi ramana kollektîf dikirin mijarên xwe û hem rê li întegrasyona wan hem jî rê ji bona civakeke pirçandî (Multikulturalität) vedikirin. Lê belê îro ev helwestbaz û helwestbazên din, yê ku rê li civakeke pirçandî vedikin, wek „kevin“ û „ne li gora civaka Elmanya“ tên nirxandin û di warê zanyarî de tên „bêqîmet“ kirin. Yek ji wan „têzê întegrasyona navîn“ (Binnenintegrationthese) ya Elwert (1982) e û ya din „koloniya etnîkî“ (ethnische Kolonie) ya Heckmann (1992) e. Li gora „têzê întegrasyona navîn“ ya Elwert pewist e, koçber di serî de di nav hev de pergaleke alîkariyê

<sup>5</sup> Hêjayê gotinê ye ku xebat bi wan biyografiyan re berdeyam e. Ji bona guftûgoyên newşî pir dane hatine tomarkirin.

deynin, ji hev re bibin alîkar ku karibin xwe entegreyî civaka mezin bikin. Bi vî alî koçber wê nasnameyek saxlam hebîn û di entegrasyonê de xwe wunda nakin, wê zanebûnên pewist yên li ser civaka mezin di serî de di nav hevde bigrin û saziyên xwe ava bikin ku wê kutleyê entegreyê civaka mezin bikin. Helwestbaza „koloniya ethnîkî“ ya Heckmann jî dibêje ku koçber di serî de di nav hevde bin, wê baleke bingehîn bidin ku koçber takekesiya xwe ava bikin û bi takekesîya xwe di nav civata xwe de nezîkî civaka mezin bibin (Heckmann 1992: 96-97). Li gora Heckmann, wekî koçber di serî de wek kutleyek werin dîtin, wê peywirên giring bînin cih, wek alîkariya xwe bi xwe di saziyan de ava bikin, takekesiya xwe xurt bikin û xwestinên xwe bînin zimên. Pewist e were gotin ku Heckmann têgîna „kolonî“ ji ya „getto“ cuda dike û ji dêla „getto“, „kolonî“ bikar tîne<sup>6</sup>. Ev herdu helwestbaz ji bona entegrasyoneke kollektîf, ji bona pêşîtgirtina „şoka çandî“ û „marjînalîzasyon“, avakirina nasnameyeke saxlam xweyî „gotinên saxlam“ bû. Lê belê ev helwestbaz di akademyê de hatin „bêqîmet“ kirin û rê ji bona rêbazên takekesî, wek ya Esser (2004), wekirin. Rêbazên takekesî koçberan wek „kes“ dibîne û wan bi serê xwe têxe bin peywira entegrasyonê de.

Newşa yekemîn di destpêka lêkolînên li ser koçberan de di mijara entegrasyonê de wek mijarek sereke dihat dîtin. Di destpêka sedsala 20'an de bi gelemperî li Dewletên Yekbûyî Yên Amerika (DYA) teoriyên entegrasyon û asimilasyonê hatine afirandin (bnr. Kurthen 2002). Balkeşiya van teoriyan ev bû ku bi tewahî Modelên-Pirnewşî (Drei-Generationen-Cyclus an Mehr-Generationen-Model) bûn (bnr. Aumüller 2010; Grote 2011). Bi van teoriyan dihat „hêvîkirin“ ku bi guhertina newşan re, newşên nu girêdaniya çand, civak û hevgirtina bi pêşrayên (bavûkal) xwe jibîr bikin û bibin wek mirovên civaka koçgirt yanî ya Amerîka. Hêvî ev bû ku cudatiya koçber û mirovên civaka mezin (WASP) ji holê rabe (Akkulturasyon) (bnr. Firat 2003; Beaud & Noiriel 2003). Vê baweriyê heta demekê nezîk jî, teoriyên koçberiyê bandor kirin. Lê belê di demên nu de tê dîtin ku ev hêviya wan teoriyan ya wek dihat xwestin, naye cih. Mirov kare vê mijarê bi gotûbêjên cuda binirxîne, lê belê sedema vê encamê ya mezin ev e ku jihev cudabûna newşan, wekî teorîzanan ji xwe re hêvî dikirin, nehat cih.

Anko rewşa newşê yekemîn têde û sedemên gelek pirsgirekên wan, mijara ne-entegrebûna wan e, pewist e li vir qala mijara têkiliya entegrasyon, marjînalîzasyon û newşa yekemîn were kirin. Di dîroka teoriyên koçberiyê de têkiliyek wusa cara yekemîn ji aliyê dibistana şîkako (Chicaco Schule) ve hatiye kirin (bnr. Alba & Nee 2004). Armanca wan zanyaran, di serî de ya Ezra Park, ev bû ku teoriyekî ji bona asimilasyona koçber, koleyên berê, runîştîyên otokton û mirovên sipî bi hev re biafirênin. Hêjayê gotinê ye ku ev mijar taybetiya civaka Amerîka Bakur bû. Gelekî bi navê Emerîqîyan nebû, lê dewletek hebû û ji bona vê yekê elîtên wê derê wusa didîtin ku ev civakên cure cure di nav hev de werin bişavtin (asîmîle kirin). Amerîka Bakur dewleteke bi koçê hatibû afirandin û

<sup>6</sup> Li gora Heckmann (1992: 97) kolonî têgîniyeke lêkolîna koçberî ya berê ye. Wekî komek mirov koçî welatekî din bikin, xwe li vî welatî li dewerên cure û ne li derekî tenê bi tewahî bicih bikin, nasnama xwe biparêzin û saziyên xwe ava bikin, jê re *kolonî* dihat gotin. *Community an civaka ethnîkî* di heman wateyê de ne.

bi vê karaktera xwe ji Elmanya cuda ye<sup>7</sup>. Têgihîştina wan zanyarên li ser mantikek pir hesanî dirunişt, her newşa nu ya ji gel, civak û olên cuda wê bi heman konteksî were perwerdekirin û bi vî şeklî wê xwe hinekî ji yê kevin cuda bikin û piştî sê-çar newşan hemu wê bibin wekhev yanî bi nasnameyekî, çandeyekî, bi girêdan û hesibandina civakekî werin bişavtin û wê yekîtiyek ru bide. Hêvî ev bû ku bi vî alî nijadperestiya mirovên sipî di nav civakê de kêmbibe. Ji vê modelê re „race relation cycle“ („çerxa têkiliyên nijdî“) tê gotin (Aumüller 2009). Li gora Park û endamên din yê dibistana şikako ev pêvajoyek mecbûrî bû û di dawî de ev mirovên cuda cuda wê di nav hev de werin bişavtin û ji vê rewşê re Melting-Pot (kaseya salateyê) dihat gotin. Yanî „hemu cureyên sebzeyên salateyê wê di nav hevde werin tevîhevkerin“ û civakek nu ru bide. Wek hatî gotin, ji destpêka sedsala 20an heta salên 1960an dihat bawerkerin ku pêşdîtinên teoriya dibistana şikako werin cih, lê belê ji salên 1960î ve tê guftûgokirin ku melting-pot, wek teorî dibîne, nehatiye cih. Çima? Bersivên vê pirsê cure cure ne û yek ji wan jî mijara „qutbûna newşan“ yanî mijara jihevqutbûna wan e. Pêşdîtinên melting-pot nehatin cih, anko newş ji hev qutnebûn û jihevqutbûn an nejihevqutbûna newşan, mijarek newşa ye (bnr. Kehrer 1959; Mead 1974; Leonard 1984; Engels 1984). Mijara newşan heman demî guhertina rewşa jiyana civakî û binyada malbatê dipêjirêne. Ya muhîm malbat e û malbat bi binyadên xwe têkiliyên newşan verast (Regulieren) dike. Ev xal e ku wateya malbata Kurd di diyasporayê de bi rolên wê ve dide xwiyakirin û xwe di rewşên nu de ji nu ve avadike û belav nabe. Ev mijar vê di xebata li ser „Nurudanên malbata Kurd li diyaspora“ were guftûgokirin.

Di mijara koçberiyê de hem ji aliyê entegrasyonê, hem ji aliyê pîrsgirekên takekesî, civakî, nasnameyî, dijmintiya biyaniyan hem jî li cem newşan di warê marjînalîzasyonê de mijarek muhîm e. anko di nav civata Kurd ya Elmanyayê de ev fenomen heye û zedê dibe, pewist e li vir were guftûgo û şîrovekirin.

Ezra Park marjînalîzebûn wek, kesê ku posîzyona wî di keviya civakê an çinekî de be, pênaskiriye (Endruweit & Trommsdorff 1989: 413). Ev mirov jiyana xwe di navbera du civat, kom, çîn an civatan de dideynin. Di vir de mirov entegreyî yekî ji herduka jî nabe. Wekî mirov li gora pênasiya marjînalîzasyon here, her kes, tişt, rewş an kom yê ne „normal“ wek marjînal tên dîtin. Ji bona vê yeke gel, civat an komên wek Çîngene, koçber, homoseksuel, alkoholîk, dîn, mirovên hêjar, kesên di jêrçandan de û hwd. wek marjînal tên dîtin (Endruweit & Trommsdorff 1989: 415). Kesên marjînal bi gelemperî di çîneya herî nimz de ne, her demî rastî demxekirin, şitîgma, diskriminalî û îsolizasyonê tên.

Mijara margînalîzasyon mijara „keviyê“ ye (Dorsch 1970: 258) û di warê koçberiyê de bi gelemperî wek; „têkiliyên nebiserketî yê di navbera kesên koçber û civaka mezin ya ku koçber di gettoyên xwe de digre“ tê pênaskirin (Endruweit & Trommsdorff 1989: 414). Li gora Esser (2004: 46)

---

<sup>7</sup> Hêjayê gotinê ye ku teoriya dibistana şikako hêjî li Elmanya bala zanyaran dikişîne. Ji bona vê wek mînak bnr. Aumüller (2009).



marjînalîzasyon ev e, wekî yekî koçber ne di civaka mezin, ne jî di civata xwe bi xwe de cih bigre û ji herdu civaka dur bikeve, ye. Yanî wekî „entegrasyona civakî tune be“, marjînalîzasyon heye. Di warê takekesî de jî; ji yên di nêvenga marjînalîzasyonê de jiyan dike, mirovê marjînal tê gotin (Endruweit & Trommsdorff 1989: 413). Kesên marjînal bi gelemperî bi biyanîbûn (Entfremdung), hîssê nîrxên nimz (Minderwertigkeitgefühl), xwewundakirin (Desorientierung) û cihgirtinê cuda (Statusinkonsistenz) ve tîr giredan. Marjînalîzasyon bi gelemperî di warê sitresa akkulturasyonê (Akkulturationsstress) de derdikeve. Yanî wekî yekî koçber hem ji çanda xwe durbikeve (biyanîbûn ru bide) hem jî nikaribe şertûmercên civaka mezin benê cih, dikeve nav sitresê de û ev jî vî marjînalîze dike. Li gorî teorî û xwestinên civaka mezin, entegrasyon karê takekesan e (bnr. Esser 2004) û şertê yekemîn ji bona entegrasyonê jî, avakirina takekesî ye. Lê belê heman demî wekî takekes ne di civata xwe de ne jî di civaka mezin de cihbigre, marjînalîze dibe. Ev pîrsgirek ya herî girîftî ya pergala civakên koçber (Einwanderungsgesellschaft) e. Anko rêbazên ku vê rewşê tîne zimên, ji nav zanyarî de durxistine û rêbazên li ser rola takekes dirawestî, bersiva vê rewşa girîftî nadin, mijar bi gelemperî tî nedîtin. Newşê yekemîn bi tewahiya rewşa xwe ve, dikeve nav wan pênasîyan de û mijara marjînalîzasyon beşek pîrsgirekên wan yê takekesî ye, ê belê marjînalîzasyon wek beşek pîrsgireka çandî behtir li cem newşên duyemîn heye.

### Pênasiya Newşa Yekemîn Yên Koçber

Wek hatî gotin, îro, bi kategoriyeke fereh, du cureyên newşên yekemîn yê koçberên Kurd li Elmanya hene<sup>8</sup>. Ev, newşa yekemîn ya karker û ya penaber e. Her yek ji wan newşan xweyî taybetiyên xwe ne. Newşa yekemîn ya karker hêdî hêdî ji vê cîhanê bar dike, lê ya penaber hê bi serxwe ye û hingî diçe zêde dibe. Berî ku mirov li ser wan herdu cureyên newşên yekemîn rawest e, pewist e, pênasî û çarçoveyeke gelemperî ya newşa yekemîn lidarbixe.

Di vê nivîsê de newşa yekemîn wek; *mîrovên li ser bingîha genaolojî yê wek dêûbav an bi malbata xwe re koç kirin, an piştî gihayîn malbata xwe an jî piştî malbata xwe anîne cem xwe*, hatiye pênaskirin. Yanî newşa yekemîn ev kesên xweyî newşên din in (bnr. Karatas 2018). Yanî newşa yekemîn ya koçber ji wan mirovan pêk tî, yê an bi serê xwe an jî wek dêûbav cara yekemîn koç kirine. Ev pênasî li gora malbata Kurd ya koçberiyê û ne li gora civaka Elman hatiye pêjirandin. Zarokên vê newşê wek *newşa duyemîn* hatine pênaskirin. Hinek zarokên wan li welêt, hinek jî li Elmanya hatine dinê. Ev herdu jî wek newşa duyemîn tî pênaskirin. Lê belê anko ev herdu kom ji hev cuda ne, pewist, cudatiya wan di pênasîyê de were dîtin. Di vê xebatê de ji wan kesên li Elmanya hatine dinê re, wek *newşa duyemîn ya xweru* û yê li welêt hatine dinê, wek *newşa duyemîn ya duçandî* hatine pênaskirin. Neviyên newşa yekemîn wek *newşa siyemîn*, neviçirkên newşa yekemîn wek *newşa çaremîn* hatine dîtin. Hêjayê gotinê ye ku hem kategoriyeke hem jî pênasîyê wusa gelek

<sup>8</sup> Ji bona pênasî û karakterên newşê û cudatiya newş û hevgerîna newşan (Generativität) bnr. Karatas (2018)

pirsan bi xwe re têne, lê belê li vê derê wê li ser wan pirsgirekan newe rawestin<sup>9</sup>. Lê belê bi gelemperî mirov kare bêje ku avakirina newşan (generation building) wek newşa yekemîn ya karker û penber runiştîye. Hêjayê gotinê ye ku tu îddiaya van kategoriyan ya wek „yên herî rast“ tune ye. Ev kategori hatine danîn û newş bi vî alî ji hev hatine cudakirin ku rewş, cih û rola newşên yekemîn bi hesanî were têgihîştin. Lê belê hejayê gotinê ye ku mijara klasîfîzekirina newşan (age grading) di nav civaka Kurd de ne runiştî ye (bnr. Karatas 2018: 158).

Newşa yekemîn ya koçber ji wan kesan pêk tê yê ku cara yekemîn koç kirine. Ev pênasî gelek caran alîkariyeke mezin ji bona koçberên yekemîn nade. Sedemek ev e ku newşa duyemîn hem *pirçandî*<sup>10</sup> (yên li welatên koçdan hatine dinê) hem jî *xweru* (zarokên li welatê koçgirt hatine dinê) ye. Yanî ne tenê hinek dêûbavan serpêhatiya koçberî û hînbûna welatê xwe jiyan kirine, hinek zarokên wan jî heman rewş jiyan kirine. Sedemeke din jî ev e ku bi gelemperî li Elmanya newşa koçber ya yekemîn kesên wek „*koçberên mehvan*“ yê piştî sala 1961'î hatine Elmanya, tê têgihîştin (Schroeder 2003: 24). Sedema din jî ev e ku êdî newşa çaremîn li Elmanya mezin dibe û –wek hatî gotin – civaka Elman pêwendiyê xwe zêdetir diberde ser newşên nu û li ser newşa yekemîn ne raweste.

Wekî mirov dinerê, dibîne ku yekitiyek ji bona krîtera pênasiya newşa yekemîn tune ye. Kriterek ji wan „*cihê rojbûnê*“ ye. Li gora vê pênasiye kesên ne li Elmanya hatine dine, wek newşa yekemîn tên kategorîzekirin. Di vê pênasiyê de herdemî zarokên bi dêûbavên xwe re hatî, dibin pirsgirek. Wek li jor hatî gotin, newşa yekemîn yê wek dêûbav cara yekemîn koç kirine, zarokên xwe bi xwe re anîn. Ev kes di literatûrê de bi gelemperî wek „*newşa navber*“, zarokên li Elmanya hatine dinê wek „*newşa duyemîn û ya siyemîn*“ tên pênaskirin (Schroeder 2003: 24). Kritereke din ya pênasiyê jî ev e ku mijara genalojî wek bingeh dibîne. Li gora vê pênasiyê dêûbavên cara yekemîn koçkirin, *newşa yekemîn*, zarokên wan *newşa duyemîn* in (bnr. Lajios 1991). Ev krîter di vê xebatê de hatiye pêjirandin.

Krîtereke din ya pênasiya newşa yekemîn, krîtera „serpêhatiyê“ ye. Li gora vê pênasiyê „kesên bi serpêhatiya koçberiyê“ û „kesên bêserpêhatiya koçberiyê“ hene û kesên bi serpêhatiya koçberiyê newşa yekemîn in (Bracker 2017: 38). Lê belê peyva *newşên koçber* û *newşên biyanî* ji hev cuda ne. Ev pênasî wek fermî ji aliyê saziyên dewleta Elman tê bikaranîn. Li gora saziyên fermî yê Dewleta Elmanya; „kesên bi serpêhatiya koçberiyê ev in, yê ku piştî sala 1949 koçî axa îro ya Dewleta Federalî Ya Elman kirine. Ji bilî wan kesan, hemu *biyanî* û *Elmanên* li Elmanya hatine dinê yê ku herî kêr yek ji dê an bavên wan biyanî ne, kesên bi serpêhatiya koçberiyê ne“ (Statisches Bundesamt 2010: 6).

Bi gelemperî mirov kare bêje ku newşên yekemîn wek wan kesan tên pênaskirin; yê dêûbavên wan ne li welatê koçgirt hatine dinê ne. Pênasiyên wusa gelek pirsgirekan derdixin holê, anko kesên bi

<sup>9</sup> Ji bona guftûgoyeke bi nerîna kêşeya navnewşî li ser têngîna newş bnr. Karatas (2018).

<sup>10</sup> Ev zarokên ku li welatê dêûbavê xwe hatine dine û li vir demekî jiyan kirine, wek „*newşa navber*“ (Zwischengeneration) tên binavkirin. Bnr. Schroeder (2003: 24).

malbat û zarokên xwe re koç kiribin, statuya zarokên xwe yê bi xwe re anîn (newşa duyemîn ya pirçandî), diguherêne. Li gora vê pênasiyê, kesên ji newşa duyemîn ya pirçandî û zarokên wan jî dibin newşê yekemîn, anko ev kes ne li welatê koçgirt hatine dinê. Yanî lo gora pênasiya fermî pêkan e ku sê newş wek newşa yekemîn werin pênaskirin. Bi rastî jî wekî mirov koçberan di civakeke modernde de wek newşan kategorîze bike, newşa duyemîn ya pirçandî nakeve nav newşa yekemîn û ya duyemîn de, anko ne li welatê dêûbavê xwe mezin bûne, ne jî li welatê Elman hatine dinê. Ev rewş di biyografîyên hatine tomarkirin de xwe didin xwiyakirin. Wek mînak;

<b>Newşa Yekemîn</b>	<b>Newşa Duyemîn</b>		<b>Newşa Siyemîn</b>	<b>Newşa çaremîn</b>
<b>Dêûbav</b>	<b>Zarok</b>	<b>Cihê Rojbûnê</b>	<b>Nevî</b>	<b>Nevîçirk</b>
Ibrahim (1950) & Gulbahar (1954) (1978 Koçkir)	<b>Newşa pirçandî</b>			
	Hasan (1973)	Welat	Sê zarok	Nevîçirk
	Hunkar (1974)	Welat	Du zarok	Nevîçirk
	Cemile (1976)	Welat	Sê zarok	-
	<b>Newşa xweru</b>			
	Rojda (1982)	Elmanya	Zarokek	-
	Şerwan (1989)	Elmanya	Ne zewicî	-

**Şema:** Newşê yekemîn (Dêûbav), newşa duyemîn ya pirçandî û xweru û newşa siyemîn û ya çarê ya koçberên Kurd yê karker.

Wekî mirov krîtera „serpêhatiya koçberiyê“ bigre, têne nevîçirkên Brahîm û Gulbahar newşa duyemîn in. Lê belê li gora civata Kurd ya koçber û krîtera genelojiyê newşa çaremîn in. Lê belê zaroka Rojda li gora pênasiyên fermî yê Elmanya dibe newşa duyemîn û li gora civata Kurd newşa siyemîn e.

Di nav wan şîroveyan de rastiyeke herî giring heye ku zarokên li Elmanya hatine dinê, koç nekirine û ne koçber in. ev kategorî û pênasiyên newşa yekemîn ya civaka sereke ne û kategoriyên wusa ji bona mijarên hemwelatîbûn, entegrasyon û polîtîka navwelatî tên kirin. Lê belê wekî mirov civatên koçber bi binyadên wanyên civakî şîrove bike, kare kategoriyên cuda jî biafirêne. Di vê xebatê de „kategoriyek genalojîk“ hatiye bikaranîn. Wekî mirov kategorî û pênasiyên fermî yê Elman bikar bene, rewşeke newşa yekemîn ya „herdemî“ derdikeve holê. Wekî mirov dibîne ku di vê kategoriya genalojîk de yek ji newşa duyemîn ya xwewerû an newşa siyemîn, bi yekê ji welêt hatî re bizewice, sitatuya zarokên wan dibe pirsgirek û tevilhew dibe. Anko gelek koçberên ji newşa siyemîn an çaremîn yanî li gora kategoriyên fermî yê dewleta Elman, newşa duyemîn ji welatên dêûbavên xwe dizewicin rewşa kategoriya „serpêhatiya koçberiyê“ berdewam dikin.

Kategoriyeke wek newşa yekemîn (dêûbav), newşa duyemîn ya pirçandî (zarokên li welatê dêûbavên xwe hatine dinê), newşa duyemîn ya xweru (zarokên li Elmanya hatine dinê), newşa siyemîn (zarokên newşa duyemîn) û newşa çarê (zarokên newşa siyemîn) kare rewşa newşan bide xwiyakirin. Newşa

siyemîn û ya çaremîn bi tewahî li Elmanya hatine dinê. Hejayê gotinê ye ku ev kategoriya li jor hatî danîn, li gora koçberan hatiye danîn û têgîna newş di warê genaolojî de dideyne. Naveroka têgîniya newş di her warî de û li gora krîtera pênasiyê tê guhertin. Wek mînak, wekî mirov çandê wek krîter bipêjirêne, hingî gelek caran newşa yekemîn û newşa duyemîn ya pirçandî dikevin heman kategoriye de<sup>11</sup>.

Wek li jor hatî guftûgokirin, pîrsa kategori û pênasiya newşan bu bi gelemperî ya newşa yekemîn ne hatiye çareserkerin. Heman demî de pîrsgireka hijmara kesên newşa yekemîn jî pîrsgirekek girîng û wulkasî girîft e. Li jêr wê pêşniyariyek li ser pîrsgireka hijmara newşên yekemîn yên Kurd li Elmanya were guftûgokirin.

### **Tahmîna Hijmara koçberên Kurd û Ya Newşên Yekemîn Li Elmanya**

Di tewahiyê lêkolîn û guftûgoyên li ser Kurdan de mijara hijmara Kurdan her demî û li her derî tahmîn in. Ji bilî Kurdistanê Başur<sup>12</sup>, li tu derî hijmara Kurd ne diyar e û kî, kîjan hijmare bide jî, ji tahminan na bure<sup>13</sup>. Ji bona peytkirina hijmara Kurdan ji bilî tahminê jî, tu rêbazên din tune ne. Li gora hikumeta Elman di sala 2010 de hijmara Kurdan li Elmanya 800 000 bû<sup>14</sup>. Lê belê ev hijmar di bingeha xwe de ne zelal e. Mirov nikare jê derxe, gelo ev hemu biyanî an yê hemwelatî jî di nav dene. Zarokên ku jiberxwe hemwelatiya Elman sitandî, di navde ne an no? û hwd. pîrsgirekên wusa ne pêkan e ku di rewşa îro de werin çareserkerin.

Li gora îstatistikan di sala 2017an de 10,6 mîlyon biyanî li Elmanya jiyan dikin<sup>15</sup>. Hêjayê gotinê ye ku ev hijmar, ne hijmara hemu biyaniyan e. Kesên ji dewlet an heremên biyanî koçî Elmanya kirîn, wek Aussiedlär û Spätaussiedler, lê ji kokê xwe ve Elman in, ne di nav van hijmaran de ne (Krämer & Baune 2004: 11). Ji bilî wan kesan, kesên hemwelatiya Elman sitandin jî nakevin nav van hijmaran de. Ev kes tenê ev in, yê pasaporta welatekî din hene yanî biyaniyên bêhemwelatiya Elman in.

Wê li vir jî tahmînek li ser gelemperiya hijmara Kurdan û li ser hijmara mirovên newşên yekemîn yên Kurd were kirin. Lê belê ku bingeha tahmina hijmaran were danîn, wê îstatîstîkên fermi yê dewleta Elman bi tahmînen zanyarên bi navûdeng yê Kurd û ne Kurd were berisandin (hesapkirin). Di vir de

<sup>11</sup> Mead (1971) newş bi vî alî kategorîze kirine. Ji bona bikaranîna modela Mead li ser newşên Kurd bnr. Karatas 2018

<sup>12</sup> Hijmara herema Kurdistanê li Iraqê di rupela Hikumeta Heremê ya fermî de 5.2 mîlyon xwiyadike <http://cabinet.gov.krd/p/page.aspx?l=12&s=050000&r=304&p=214>. Ev hijmarî tu hestê baweriyê nadin.

<sup>13</sup> Wek mînak; li gora zanyarê zangoya Îzmirê Dr. Serhun Al hijmara Kurdan 30 mîlyon e: li îranê 8,1 mîlyon, li Iraqê 5,5 mîlyon, li Surî 1,7 mîlyon û li Tirkî 14,7 mîlyon in. Ji bona hijmara Kurden li dewerên din û diyasporayê raqaman nade. Bnr. Al (2016).

<sup>14</sup> Parlamentera Elman Ulla Jelpke û hevalê wê di sala 2010an de ji parlamentoya Elmanya pîrsa „Çareserkerina Kêşeya Kurd û Rola Elmanya“ kir. Parlamentoyê 24 rêşemî 2010'ê de bersiv da. Di bersiva xwe de da zanîn ku li Elmanya 800 000 Kurd dijîn. Bnr. Jelpke (2011).

<sup>15</sup> Bnr. Pressemitteilung (12.04.2018).

wê rêjeya hijmara Kurden li dewletên dabeşker<sup>16</sup> ji bona rêjeya kurdên koçber di nav koçberên ji wan dewletan de were berisandin. Ev îstatîstika jêr hijmara mirovên ji çar dewletên dabeşker hatine, dide xwiyakirin. Ji bona tahmineke bibingeh îstatîstikên li berdest ev in: hijmara gelên dewletên dabeşker û hijmara koçberên ji wan dewletan. Armanç ev e ku li gora rêjeya Kurdan li Îran, Surî, Îraq û Tirkî, rêjeya Kurdên koçber di nav koçberên ji wan dewletan de were peyt kirin ku tahminek li ser hijmara newşên yekemîn were danîn.

Ev îstatîstika jêr hijmara kesên ji dewletên dabeşker dide xwiya kirin.

Hemwelatî	Tevahî	Rêjeya Biyaniyan	Mêr	Rêjeya Di Nav Biyaniyan De	Jin	Rêjeya Di Nav Jinên Biyanî De
	Hijmar	di%	Hijmar	di%	Hijmar	di%
Tevahî	10 623 940	100,0	5 742 180	100,0	4 881 760	100,0
Türkei	1 483 515	14,0	764 935	13,3	718 580	14,7
Syrien	698 950	6,6	428 960	7,5	269 990	5,5
Irak	237 365	2,2	140 655	2,4	96 710	2,0
Iran	102 760	-	60 955	-	41 805	-

Şema: Hijmarên Di Warê Zayend û Hemwelatiyan Li Gora 31.12.2017<sup>17</sup>

Hijmara biyaniyên li gora îstatîstikên sala 2017an yê ji Tirkî hatin 1 483 515 e û rêjeya wan di nav biyaniyan de % 14,0 e. Hijmara mirovên ji Tirkî hatî û an xweyî du-hemwelatî an jî hemwelatiyê Elman sitandî jî 1.376.485 kes in. Yanî hijmara kesên bûyîn hemwelatî û nebûyîn hemwelatî hemen hemen wekhew in. Hijmara kesên ji Surî hatin 698 950, yê ji Iraqê hatin 237 365 û yê ji Îranê hatin 102 760 kes in. Tevahiya biyaniyên li Elmanya yê ji dewletên dabeşker (Tirkî, Îran, Iraq û Surî) hatin, 2.522.590 in. Ev hijmar tenê yê kesên ku hê hemwelatiya Elman nesitandine. Di wan îstatîstikan de kesên hemwelatiya Elman sitandî, nayen xwiyakirin anko ev kes wek „Elman“ tên dîtin. Mirov kare angaş bike ku qasî vê hijmarê kes jî hemwelatiya Elman sitandine<sup>18</sup>. Hijmarên

<sup>16</sup> Anko her demî navê wan dewletên Kurd di nav xwe de par kirin –Tirkî, Îran, Iraq û Surî – nevin danîn, bi kurtasî wê ji wan dewletan re wê „dewletên dabeşker“ were gotin. Di nêvenga zimana Elman de ji vê re „Teilungsstaaten“ tê gotin. Bnr. Kesen (2009); Asadi (2007); Mönch (1994); Skubsch (2002); Ammann (2001) û Salih (2004).

<sup>17</sup> Ev sema ji vê derê hatiye sitandin: Ausländische Bevölkerung nach Geschlecht und ausgewählten Staatsangehörigkeiten. Ausländische Bevölkerung nach Geschlecht und ausgewählten Staatsangehörigkeiten am 31.12.2017. <https://www.destatis.de/DE/ZahlenFakten/GesellschaftStaat/Bevoelkerung/Migrati onIntegration/AuslaendischeBevolkerung/Tabellen/Geschlecht.html>

<sup>18</sup> Li gora agahiyên dewleta Elman berisandineke wusa ne xelet e. Li gora hijmarên sala 2016 li Elmanya 82,4 milyon mirov dijin. Ji wan 63,8 milyon yanî % 77,5 Elmanên bê bingiha koçberiyê ne. Hijmara biyaniyan bi tevahî yanî yê biyanî û yê hemwelatî sitandî, 18,6 milyon yanî % 22,5 in. Di nav wan kesan de 9 milyon yanî % 10,9 biyanî; 9,6 milyon yanî % 11,7 kesên hemwelatiya Elmanya sitandine. Yanî hijmara wan hemen hemen qasî hev e. Bnr. Bpb (4.4.2018).

biyaniyên ji Tirkî û yên ji Tirkî hatî û hemwelatiya Elman sitandî hemen hemen wekhev in. Yanî mirov kare bêje ku mirovên ji herçar dewletan hatîn qasî 5.045.180 in. Pirsra muhîm ev e, gelo çiqas ji wan mirovan Kurd in? Ji bona bersivandina vê pirsê pewist e, rêjeya hijmara Kurdan li dewletên dabeşker wek bingeh were dîtin. Ji bona vê yekê tahmînên rêjeya gelê Kurd li dewletên dabeşker li gora zanyarên curê wek li jêr hatî danîn, xwiya dike.

Zanyar	Rêjeya hijmara gelê Kurd di nav hijmara gelên dewletên heremê de			
	Tirkî	Îran	Iraq <sup>19</sup>	Surî
Vanly (1986: 44)	% 24	% 16	% 27	% 9
McDowall (2004: 24-25)	% 23	% 10	% 23	% 8
van Bruinessen (2003: 31)	% 19	% 10	% 23	% 8,5
Nezan (2003: 22-24)	% 25,42	% 14	% 30	--
Izady (2011: 288)	% 19	% 8,4	% 5,6	1,6
<b>Tahmînên ji bona vê xebatê hatî kirin</b>	<b>% 23</b>	<b>% 12</b>	<b>% 22</b>	<b>% 8</b>

Şema: Rêjeya hijmara gelê Kurd di nav hijmara gelên dewletên heremê de<sup>20</sup>

Li gora vê tahmînê ji koçberên Tirkî yên nebûyîn hemwelatê Elman % 23 Kurd in û hijmara wan 341.208 kes in. Yê ji Îranê 12 331 kes Kurd in. Yê ji Iraqê 52 220 kes Kurd in. Yê ji Surî 55 916 kes Kurd in. Li gora rêbaza rêjeyê 461 675 Kurd ji her çar dewletan li Elmanya wek biyanî jiyan dikin. Wek hatî gotin pewist e, kesên hemwelatiya Elman sitandî wek kasî hijmara yên biyanî be. Ji bilî Kurdên ji dewletên berê yên Sowyet, ji Lîbanon, Ermenistan, ji deverên dijî herema Kurdistanê (heremên bi nakok) û derên din hatîn, tenê yê ji çar dewletên dabeşker hatîn, qasî 923 350 kes li Elmanya jiyan dikin. Yanî di nav tevahiya koçberên ji çar dewletan de, rêjeya koçberên Kurd % 19 e. Bi hijmara koçberên ji deverên dijî dewletên dabeşker re, ev hijmar ji milyonekî dibure. Lê belê anko ev hijmara hatî der jî tahmîn e, wê li vir li ser milyonek Kurd were rawestin. Ev hijmar bi rastî ne hijmareke dijî aqil e û ji gelek tahmînên zanyarên bi navûdeng kêmdir e.

Li Elmanya milyonek Kurd dijîn û li gora vê hijmarê, Kurd di nav tewahiyê biyanî û biyaniyên bi hemwelatiya Elmanya de ku hijmara wan bi tewahî 18,6 milyon in û rêjeya koçberên Kurd di nav biyaniyên li Elmanya de % 5,37 e. Li gora vê berisandine Kurd li Elmanya piştî Tirkan kêmeteweya duyemîn in (bnr. Bpb 1.4.2018).

---

*Zugriff: 16.05.2018.* Hêjaye gotine ye ku berskirina (hesapkirina) wan hijmara ji bona kesên bi xwe Elman lê ji dewletên din hatine Elmanya (Aussiedler) hinekî bi pirsgirek e, lê bêle armanç ne ev e, hijmarên sedî sed bide, tenê fikrekî nezîkî rastiye bide.

<sup>19</sup> Îro hijmara gelê Iraqê 36 milyon in û ya herema Kurdistanê 6 milyon in yanî % 17 Kurd in. (<https://www.auswaertiges-amt.de/de/aussenpolitik/irak/203976>). Lê belê di nav van hijmaran de derên ji Herema Kurdistanê hatine qutkirin ne di nav de ne û bi hijmaran wan jî rêjê tê guhertin.

<sup>20</sup> Hêjayê gotinê ye ku van zanyaran ev berisandine xwe ji bona demên cuda cuda afirandine, yanî ji bona salên cuda hatine berisandin û bi tewahî tahmîn in. Ne li vê derê ne jî li cem zanyarên hatine

Di vê babetê de mijareke li ser tahmînan diçe û hê nehatiye çareserkirin ev e ku mirov nizane, gelo rêjeya koçberên Kurd yê karker û ya penaber çiqas e. Susanne Schmidt (2000) di xebata xwe ya empirîk de angaşî dîke ku % 80-90 koçberên Kurd yê bi rêya kar hatine Elmanyayê ne û tenê % 10-20 yê bi rêya penaberî hatine (Schmidt 2000: 17-18). Lê belê di xebata wê ya li ser Kurdên Elmanya de xwiya dîke ku % 59 kesên tewlî lêkolîna we bûne, dêûbavê xwe wek „karker“ dane û % 32 sedema hatina dêûbavên xwe wek „siyasî“ û % 9 wek „siyasî û aborî“ dane xwiyakirin. Yanî rêjeya koçberên karker û ya penaber hemen hemen nivî nivî ye. Yê wek karker hatî % 59 û yê siyasî % 41 in (Schmidt 2000: 37). Anko ev mijar nikare were serêrastkirin, di vê xebata berdest de hijmara koçberên karker û yê penaber wekhev hatiye pêjirandin.

Li gora guftûgoyên li ser newşên yekemîn behtir were têgihiştin, pewist e, tahmineke bibingeh ji bona hijmara wan jî were kirin. Ji bona tahmîna vê mijarê wê dîse îstatîstîkên fermi yê dewleta Elman û tahmînen rêjeya Kurd ya di dewletên dabeşker de werin bikar anîn.

Îstatîstîkên Elman hijmara mirovan li gora temenê wan dide xwiyakirin. Wekî mirov li wan îstatîstîka dinêre, rewşeke wek ya jêr tê dîtin.

Hemwelatî	Hijmara Tewahî	Bin 20an re	Navbera 20-45 salî	Navbera 45-65 salî	Ji 65 meztir	Rêjeya Navbera Jiyanî
Elmanya	10 623 940	1 739 060	5 365 175	2 550 785	968 925	37,7
Tirkî	1 483 515	104 520	681 295	456 020	241 680	44,8
Syrî	698 950	285 050	344 280	61 530	8 095	24,2
Îraq	237 365	92 600	117 405	23 785	3 575	25,5
Iran <sup>21</sup>	102 760	15 160	62 170	19 375	6 055	-

Şema: Hijmarên Li Gora Giyanî û Hemwelatî Ya Dema 31.12.2017<sup>22</sup>

Ev şemaya jor kare fikrekî bide gelo çiqas mirov dikevin nav kategoriya newşên yekemîn de. Bi berisandineke qeba mirov kare mirovên temenê wan ji 45an zêdetir wek newşên yekemîn binirxêne. Hijmara van mirovên temenê wan ji 45'an zêdetir, bi tewahî 820.115 kes in û bi yê buyîn hemwelatî re dibin 1.640.230 kes. Anko rêjeya Kurd di nav hijmara mirovên dewletên dabeşker de % 19 e. Ji van mirovan 311.643 kes Kurd in û ev hijmara newşên yekemîn e. Yanî bi berisandineke gurover 311.000 kes ji newşên yekemîn in. Di vê hijmare de pirsgirek ev e ku di nav de newşên duyemîn jî hene. Lê belê newşa yekemîn ya penaber kare, wekî mirov yê di salên 2014 heta îro ji Surî, Îraq û Tirkî hatin bene ber çavên xwe, 18 salî destpêbîke. Ji bona ku tahminek bibingeh were kirin, hijmara newşa

<sup>21</sup> Agahiyên li ser mirovên ji Îranê li vir hatine hilgirtin: Statistisches Bundesamt, Fachserie 1 Reihe 2. Bevölkerung und Erwerbstätigkeit. Ausländische Bevölkerung Ergebnisse des Ausländerzentralregisters, 2017. Erscheinungsfolge: jährlich Erschienen am 12. April 2018 Artikelnummer: 2010200177004. Statistisches Bundesamt (Destatis), 2018. Rupelên di navbera 33-57. Li ser internetê mirov karê datay li vê linkê bibîne: [https://www.destatis.de/DE/Publikationen/Thematisch/Bevoelkerung/MigrationIntegration/AuslaendBevoelkerung2010200177004.pdf?\\_\\_blob=publicationFile](https://www.destatis.de/DE/Publikationen/Thematisch/Bevoelkerung/MigrationIntegration/AuslaendBevoelkerung2010200177004.pdf?__blob=publicationFile)

<sup>22</sup> Ev sema ji vê derê hatiye sitandin: Ausländische Bevölkerung nach Altersgruppen und ausgewählten Staatsangehörigkeiten Ausländische Bevölkerung nach Altersgruppen und ausgewählten Staatsangehörigkeiten am 31.12.2017. <https://www.destatis.de/DE/ZahlenFakten/GesellschaftStaat/Bevoelkerung/MigrationIntegration/AuslaendischeBevoelkerung/Tabellen/Altersgruppen.html>

duyemîn ya di nav 310.000 kesî de, bi newşa yekemîn ya di kategoriyên din de hatiye wekhev kirin. Wek hatî gotin, ev hijmareke tahmînî ye û bi rastî hijmara kesên di nav newşên yekemîn yê karker û penaber de ji 310.000'î behtir in. Hêjayê gotinê ye ku kesên ji newşa yekemîn yê di kategoriyên giyanî yê 45-65 û ji 65 *mezintir* de, bi piraniya xwe ve kesên newşa yekemîn ya karker in. Kesên giyanê wan ji 65'î behtir yê ji her çar dewletan hatî 259.405 kes in. Ji wan kesan % 19 Kurd in û ev kes 49.286 yanî bi yê bûyîn hemwelatî re qasî 98.000 kes in. Hijmara wan kesan herî diçe zêde dibe<sup>23</sup>. Kesên di nav newşa yekemîn de yê rewşa wan herî xirab di nav van kesan de ne.

### **Di Diasporayê De Newşa Yekemîn**

#### **Newşa Yekemîn Ya Karker**

Koma newşa yekemîn ya karkerên Kurd ya herî mezin ev kes in, yê ji bona kar, piştî 1961'î heman demî bi Tirkan re ji Tirkî hatine. Balkeşiya vê newşa wek „karkerên mehvan“ hatine Elmanya ev e ku wek newşeke „bûye xwisar“ tê şîrovekirin. Ev mirov wek karkeran hatin û wek karkeran man. Piraniya wan kesan naveroka jiyana xwe li Elmanya nedîtî an nikaribûn bibînin û jiyana xwe li Elmanya ava nekirin, lê belê li Elmanya man.

Ev mirov hatine civakeke biyanî ya ku ev ne demek dirêj bû, ji Şerê Cîhanê Yê Yekemîn de bi rewşeke xirabe derketî bû, felaketa faşîzm û nîjatperestî li pişt xwe hiştibû, beşek axa wê, jê hatibû qutkirin û bûbû dewletek bi serxwe. Lê dîse jî carek din bûbû aboriyeke sereke ya cîhanê. Civaka Elman civakek bû ku biyanî pir nasnedikir, dîrokeke mezin ya kolonyalîzm ya wan tune bû. Têgihîştina wan yan hemwelatî li gora giredana xunî („ius sanguines“) bû, yanî tenê yê xuna Elman hebana, wek Elman dihatin dîtin (bnr. Wippermann 1999).

Her çiqas berî newşa koçber di sala 1961'î de werin, biyaniyên wek Îtalî, Yewnanî hebûn, lê ev jî Ewropî bûn û cara yekem civaka Elman ya piştî şer hijmarek hevkas mezin yê biyaniyên „ser reş“; bi çand, nîrx û jiyana cuda dîtin û jiyana kirin. Di serî de ji xwe re digotin; „*Evê çend salan li welatê me bimênin û piştî herin*“ (bnr. Abadan-Unat 2002). Lê belê di salên nîvê 1970'yî de dîtin ku evê hatî, naçin.

Dewleta Tirk di 10ê cotmehê 1961'î de peyama karkeran bi Elmanya re çekir, lê ji bona jiyana wan li

<sup>23</sup> Li gora îstatîstîkên 31. Berfanber 1991'î li Elmanya tenê di nav biyanîyan de 300 000 kes ser temenê 60'î re bûn û rêjeya wan di nav civata biyanîyan de % 3 bûn (Holz et.al 1994: 15). Di sala 2017'an hijmara wan kesan 968.925 e. Yanî sê qed behtir bûye. Bnr. Ausländische Bevölkerung nach Altersgruppen und ausgewählten Staatsangehörigkeiten Ausländische Bevölkerung nach Altersgruppen und ausgewählten Staatsangehörigkeiten am 31.12.2017. <https://www.destatis.de/DE/ZahlenFakten/GesellschaftStaat/Bevoelkerung/MigrationIntegrations/AuslaendischeBevolkerung/Tabellen/Altersgruppen.html>



Elmanya tu amedekarî nekir. Wan mirovan di semînerêke 15-20 xulekan de agahî li ser kar, jiyana, rêz û pêvajoyê distandin. Navnîşanek didan wan û dişiyandin Elmanya (bnr. Abadan-Unat 2002). Her çiqas piştî hinek saziyên wergerê û yê olî hatin avakirin jî, di serî de xizmetên wusa nehatibûn pejirandin, lê ev xizmet li cem koçberên wek Yewnan û yê din, berî koçber werin, hatibûn amadekirin. Wan mirovan dest bi seferê dikirin ku nizanibûn, çî li benda wan e.

Hem yê Kurd hem yê Tirk heman eş, eza, diltengî û xem kişandin. Vê newşê bi gelemperî an malbata xwe piştî anîn cem xwe an jî malbat li welêt hiştin. Ji bona vê xalê, vê newşê behtir eşa malbatê kişand. Demek direj tenê man û gelek dramên malbatî derketin holê. Dewleta Tirk ev koma koçber wek her tiştî bikar anî, ji bilî wan wek komek koçber bibîne. Ji bona dewleta Tirk, ev mirov jêderka remisse<sup>24</sup> bûn, ev destê direj yê hikumeta Tirkî yê li Ewropa bûn û wekî dewletê pewist didît, ev di vî warî de bikar jî dianî. Tam jî ev xal ji tu aliyan ve nehate dîtin, ne hate lêkolînkirin, ne gonê vê jiyane, ne jî dîrok û çîroka wan hate nivîsandin. Di nerîna civaka Elman de meşrûyetiya hebûna wan „karkerî“ bû (Lajios 1991: 9). Ji bona vê yekê wekî kar nedikirin, weke barekî dihatin nixandin.

Heta salên 1970'yan newşa Kurd xwe di nav koçberên Tirkan de diveşartin. Ne Kurdbûna xwe, ne jî zimanê xwe didan xwiyakirin. Lê belê bi salên 1970'yî ve Kurdan hêdî hêdî xwe ji Tirkan cuda kir, saziyên xwe bi xwe avakirin û ji bona mijarên xwe derketin kolanan û xwestinên siyasî, çandî û civakî anîn zimên.

Newşên yekemîn yê karker yê Kurd û Tirk bi tevahî ji bona kar hatibûn û armanca wan ne ev bû ku li Elmanya bicih bibin. Di bin hişê wan mirovan de ramana dewlementbûnê hebû. Dixwestin zu dirava bidin hev û rêkin welêt. Ji bona vê yekê dem û vejena (energy) xwe dan kar û diravan. Gelekan xwe ne li zarokan, ne li malbatê, ne jî xwe li xwe kirin xweyî û jiyana normal derbasnekirin. Wekî Rêgirtina Anîna Karkeran (Anwerbestop) di sala 1973'yî de hate rawestandî û bi gelemperî peymanan wan mirovan ya bi şirketan re hatibû navişkirin, bi dawî hat. Elmanya ji hemu karkeran xwest ku êdî wegerin welatê xwe. Bi rastî hijmara hemu biyaniyan li Elmanya kêmbû, lê belê hijmara yê ji Tirkî hatin, zêde bû. Gelekên ku wegeriyan Tirkî jî carek din wegeriyan Elmanya an jî yê ji Elmanya çuyîn dewleteke din, carek din wegeriyan. Wan mirovan an bi şirketên din re peymaneke din ya kar navîş kirin, an jî çune welatekê din yê Ewropa (bnr. Abadan-Unat 2002). Sedema ne wegerana wan ne ev bû, anko wan mirovan êdî xwe nezîkî jiyana Ewropî didîtin, ev mirov ne wegerehan anko wan biryar da ku bimênin û sedema vê biryarê bi gelemperî aborî bû. Dîtin ku karin li Elmanya devlemend bibin. Di serde jî hinekî pergala dewleta civakî fêrbûn û ji bona vê yekê jin û zarokên xwe jî anîn, anko mirov karîbû bi zarokan baş diravan ji dewletê bigre<sup>25</sup>.

<sup>24</sup> Remissen tê wateya ku diravên koçber ji welatê xwe re rêdikin.

<sup>25</sup> Wan mirovan ji bona zarokên xwe yê li welêt dirav distandin, lê belê wekî zarok li Elmanya bana, behtir distandin. Ji bona vê yekê zarokên xwe anîn Elmanya. Wan mirovan didît ku rewşa aboriya Tirkî ne baş e.

Li Elmanya di salên 1975'an de wekî civata ji Tirkîyê malî û zarokên xwe jî anîn, hêdî hêdî newşên duyemîn ketine rojevê de. Wekî di dibistanan de serkeftinek ne baş dan xwiyakirin û krîmînalîtet zêde bû, behtir bala gelê Elman kişandin ser xwe.

Elîtên Elman ji salên 1982'an ve mijara politikaya biyaniyan wek „pirsgireka biyaniyan“ şîrovekirin. Êdî hewl didan hijmara biyaniyan kêr bikin û wan rêkin welatên wan. Lê belê bisernekeftin û „mehvanên nedihatîn xwestin“ nedîçun. Di sala 1991 de „Qanuna Biyaniyan Ya Nu“ derxistin. Di heman demê de Dewleta Sowyet xurîfî (1991) û Elmanên li Dewletên Sowyet berê xwe dan Elmanya. Di demê kurt de hijmara wan bilind bû. Ji bona vê yekê jî „Qanuna Penaberan“ derxistin (Başkurt 2009: 84). Heta salên 2000'an newekheviya wan mirova bi mirovên Elman re mijareke sazî bu (bnr. Schnapka 1986). Kurtasî mirov kare bêje ku di nav civaka Elman de bi pêla koçberiya Tirkî re „*Pirsgireka Biyaniyan*“ û bi ketina Dewleta Sowyetê re, di salên 1990'î de „*Pirsgireka Penaberan*“ di civaka Elman de ru da.

Diroka koçberên Kurd yê bi Tirkan re hatibûn, wek hev bû. Dîse jî newşa yekemîn ya karker di bin konteksta Tirkan de wunda bû. Ev mirov hem ji aliyê dewleta Tirk, hem jî ji aliyê komên siyasî yê Tirk, medya Tirkî û lêkolînerên Tirkan ve wek amurekî hatin bikar anîn. Lê belê wan kesan tu carî xwe li pirsgirekên vê newşê nekirin xweyî, lê belê herkesî ev mirov li gora berjewendiyên xwe bikar anîn. Îro koçberên ji Tirkîyê hatîn, koma herî mezin ya biyaniyan li Elmanya pêktênin. Ji bona vê yekê ev kes di konteksta koçberiya li Elmanya de cihê girîng digrin<sup>26</sup>.

Ev mijarên li jor hatine danîn, ji bona newşa yekemîn ya Kurd ne biyanî ne. Le belê ev newş behtir xwe wek qurbanî dibîne. Xwe ji bona zarok û malbata xwe qurban kirine. Mal ji zarokên xwe re dane hev, ew bi mal kirin, zewicandin, muhtacî tukesî nekirin.

Dema ev kes bi rêyek fermî wek karker dihatin Elmanya rewşa aborî ya heremên Kurdan ne baş bû. Di serde jî di salên 1960, 1970 û 1980 de rewşa Tirkî ya siyasî ji bona Kurdan bi xeter bû û her çiqas

---

Kêşeyên siyasî pir giran in û li Tirkî huzur tune ye. Elmanya di sala 1975e de qanuna li ser diravên zarokan guherend. Di vê qanunê de mirovan ji bona zarokên xwe yê li welêt hindik dirav distandin. Ji bona zarokên li Elmanya behtir dirav digirtin. Ji bona vê sedemê mirovan destpêkir mal û zarokên xwe bînin Elmanya. Wekî darbeya leşkerî ya sala 1980yî çebû û rewşa siyasî, aborî û civakî nexweştir bû, hatina mirovên siyasî, anîna endamên malbatê zêdetir bû. Di navbera 1974 û 1983ê de qasî 1.150.000 kes hatin Elmanya (Başkurt 2009: 83-84). Hem di darbeya leşkerî ya sala 1970'î hem jî ya 1980'yî de hijmarek mezin ya siyasîyên Kurd gihan Elmanya.

<sup>26</sup> Nerîneke dîrokî ya ne baş di derbare Tirkan de di nav civaka Elman de hebû. Gotinên wek „tikekî biçênin“, „te tirk kir“ (yanî te tiştê xira kir) an jî „Kümmeltürke“ wek peyveke sixef (bnr. Kula 1992; Spohn 2002) vê nerîna nerenî didin xwiyakirin. Tirk di civaka Elman de demên Seferên Xacê de wek barbar, şerker û agresîv dihatin dîtîn (bnr. Spohn 2002). Bi alîkariya wan nêrînen dîrokî kesên ji Tirkî hatîn, di cihde carek din hatin kodkirin û ev kes wek kesên nebaş dîtîn. Ferzenda sererk, sazî û zanyarên Tirk hebû ku wan nêrînen dîrokî serêrast bikin, lê belê wan tersê vê kir û ev nêrîn behtir di civakê de şiyar û belav kirin.

İltica nekiribin jî, Elmanya ji bona wan derekê ku xwe li biparêzin bû. Wan kesan ne tenê bi koçberên Tirk re dijî-biyaniştî ji aliyê dewlet û civaka Elman bûrandin, di serde jî dijîştî ji aliyên netewe- û nijadperestî Tirk jî kişandin. Gelek caran di mizkeft an komelan de nedihîştin Kurdî biaxivin. Nasnama wan ya ethnîkî an olî gelek caran bi „terorê“ re dihat girêdan an jî dibû mijara henekên nijadperestî.

Di lîteraturayê de ev mirov wek koça bî îradî tê pêjirandin, lê belê pir xalên vê mijarê hene ku ji bona gelek mirovan ev koça „karkerên mehvan“ jî koça neîradî ye. Weke Bock (1986: 19) têne zimên, koça bê alternatîf jî koça bêîradî ye. Gelek Kurdan ne karîbûn ji bona rewşa siyasî, olî û aborî ne li warê xwe ne jî li rojavaya Tirkî jiyana bikin. Mirovên wek Êzîdî, Suryanî, Rum, Ermenî an Kurd dijatiya nijadperestî didîtin û ji bona vê yekê koçî Elmanya dikirin, lê belê ne bi rêya siyasî, lê bi rêya karî koç dikirin.

### Newşa Yekemîn Ya Penaber

Têgînî, têbinî û pênasiya „newşa yekemîn ya penaber“ bi nakokiyên xwe ve girêdayiye. Di mijara Kurdan de têbiniyek wusa ya bi serê xwe tune ye. Anko newşeke ku di demeke eşkere de koçkirî, di demek eşkere de koç bi dawî anî tune ye. Koçberiya mirovên penaber berdewam e û bi her hatina wan mirovan endamên nu yên wê newşê derdikevin holê. Mijara penaberî mijarek girift, lê cureyek sereke ya koçberiyê ye. Ev cureya koçberî hem ne koçek îradî ye, hem jî mijarên wek, diyaspora, eksîl û civatên navnetewî di afirêne. Ji bona wan xaaan koçberiya penaberî ji koçberiya karî cuda ye. Di heman rêzî de newşên yekemîn yên penaber jî ji yên karker cuda ne û ev newş hem hem koçber, hem karker û hem penaber in.

Wek li jor hatî gotin, newşa yekemîn ya karker ne bi malbata xwe re hatibû Elmanya, lê belê newşa yekemîn ya penaber bi gelemperî bi malbatên xwe re hatibûn. Jiyana newşa penaber berî ku werin Elmanya jî di rewşeke derasayî de bû. Wan mirovan şer, kuştin, hêjarî, zilm û zext dîtibûn. Gelek ji wan endamê malbata xwe wundakiribûn, di girtîgehanda mabûn, îşkence û zext dîtibûn. Wekî bêgav man welatê xwe terk bikin, gelek ji wan di rê de heta gihana Elmanya serpêhatiyên nejbîrîkirinê burandin. Hinek bi rê de ji aliyên hezên ewlahiyê yên dewletên li ser rê de hatin kuştin, hinek di avê de xeniqîn. Hinek seqet man, gelek dem di zîndanên dewletên li ser rê de burandin. Hinek di re de dihatin girtin û teslîmî dewleta Tirk digirin, hinek wunda dibûn.

Demek direj newşa yekemîn ya penaber di kampên penaberan (Asylheim) an di konteynan de û piştê di xanîkokên wek baraka, yên nexweş de, bi gelemperî bi gelek zarokan ve di cihên teng de man. Ev der hem biçuk bûn, hem jî ne li gora jiyana malbatî bûn. Dokumentên gelek „Duldung“ (Semax-Kirin) bû, yanî Almanan bi wan re semax dikşand. Mafên wan mirovan yên karpirsgirek bû. Bi navekî nebaşî wek „asûl“ (Asyl) dihatin pênaskirin. Nave Asyl di civaka Elman de wek „*mirovên hatine ku kar û diravên Elman ji Elmanan bistênin û bêkar jiyana xwe li Elmanya biburênin*“, tê dîtin<sup>27</sup>. Tu kesî xwe li wan nedikire xweyî. Ne dewleta Tirkî, ne jî dewleta Elman ev mirov wek civakeke bi ser xwe

<sup>27</sup> Her roj li ser vê mijara bi dehan gotar tîne veşandin. Bnr. Jäggi, Sarah. Sozialpolitik: Nach unten treten. Wieso man in der Schweiz so gern Politik der Ärmsten macht. Zeit-Online. 01. April.2018

didît. Dewleta Tirk li vir jî bela xwe ji wan nedivekir<sup>28</sup>. Ji bona herdu dewletan jî ev mirov yê „terorîst“ bûn. Ji bona vê yekê sazîyên ku xwe li wan bikin xweyî, tune bûn. Tu mafê wan yê çandî, civakî, nasnameyî tune bû. Ji aliyê dewleta Elman ve wek Tirk, Ereban an Îranî dihatin dîtin. Anko siyasî bûn, di konsolosên Tirkî, Irakê û Îranê de rastî nêheqîyan dihatin. Nêvenga têde tewger û jiyana dikirin, pir teng bû. Reya nêvenga çandî, civakî, siyasî li ber wan girtî bû, tenê reya nêvenga aborî vekirî bû, wan jî ev bi kar anî û bi serkeftin. Hêjî dîmen û rewşa vî newşî di nav çarçoveya aborî de ye. Li cem newşa yekemîn ya penaber di heman demî de newşê duyemîn yê pirçandî bi xwe re anîn an jî di demek kurt de hatin gihana wan. Niha newşê siyemîn mezin dibe û newşê yekemîn dibe dapîr û papîr.

Rewşa nav û hebûna Kurd li Elmanya bi zêdebûna kesên siyasî yê penaber re hate guhertin. Bi zêdebûna wan re hijmara sazî û çalakîyên Kurdan zêde bûn. Gelemperîya wan mirovan hêjî bi siyasîyê ve girêdayî ne, an jî di siyasîyê de çalak in. Gelek ji wan mirovan ji bona karê siyasîyê ji gelek mafan bêpar in û jiyaneke qedexe dibûrenin. Wan mirovan jiyaneke di nav civakekî de derbaskir ku ne ziman, ne çand ne nirxên civakî zanîbûn. Wan mirovan, wekî bixwestan jî, nikarîbûn vegehin (Kizilhan 1995: 127). Gelekan jiyana xwe di rewşeke dijwar de bûrandin û hêdî hêdî şiyar dibin ku rewşa wan bi ne başiyê ve diçe. Ev newş bi pîrbûna xwe re dikeve bin bandora newşên nu de, marjînalîzasyona takekesî ru dide, gelek nikarin wegerin welêt û hwd. Di gotarek din de wê li ser pîrsgirekên wan were rawestîn.

Bi gelemperî koçberên Kurd yê penaber li Elmanya diyasporaya Kurd ya nujen bi hezekî xurt bi bandor kir. Ev kutle yeke polîtîk bû û di mijara nasnameya xwe de şiyar bû. Xetên êşkere di xistin navbera xwe û gelên din de û bi vî alî xwe ji Tirk, Ereban û Farsan cuda dikirin. Di demek kin de Kurdên koçber jî polîtîze kirin û hijmara wan zêde bû. Bi çalakîyên xwe navê Kurd li Elmanya û li cîhanê wek „gelekî bindest“ belav kirin. Wekî bi nasnameya Kurd xwe nîşan û diyar kirin, rastî gelek pîrsgirekan hatin, yê ku Kurden wek karker hatîn, ne bûrandi bûn.

Van kesan çanda Kurdî revîze kir, alîkarî kirin ku zimanê devkî bibe zimanekî nivîskî, jiyancîhanên nu yê bi nasnameya Kurd afirandin. Cara yekemîn bi kutleyên gir çalakîyên mezin yê wek newroz li dar xistin, tekîlî bi siyasîymendar, hunermend, sazî û komên Elmanan re danîn. Vê kutleyê hewl da ku rewşa welat û gelê xwe li Ewropa bidin naskirin. Piraniya jiyana xwe di kolanên Elmanya de li ser kuçên pilaster di çalakîyan de derbas kirin. Jin, ciwan, Kurden Sunnî, yê Alevî, yê Ezîdî organîze kirin. Sazî di warê dibistan, wêje, hunerî, çandî û civakî de ava kirin. Bi wan xebatan Kurd wek kiryar (subject) dane naskirin.

---

<sup>28</sup> Cudatiya koçberên Kurd ji yê din ev e ku wegeriya vî koçê gelek caran ne pêkan e (Kizilhan 1995: 127). Wateya vî ev e ku koçberên Kurd di „nêvengege strasî“ (Spannungsfeld) jiyana dikin. Kurd di navbera realîteya li welatê koçgirt û rewş û buyerên li welatên koçda da dimênin. Wateya vî ev e ku Kurd li Elmanya „welatekî kismî“ (Teil-Heimat) dibînin û heman demî „biyanî“ dimênin (Kizilhan 1995: 127).

**Ekskurs: Herdu News**

Wekî mirov herdu newşên karker û penaber bi hev re çavdêr dike, dibîne ku hinek xalan de cudatî û di hinek xalan de hevpariyên wan hene. Di serî de pewist e, were gotin ku bingeha jiyana wan herdu newşan jî ji aliyê malbatî ve hatiye pejirandin. Herdu newşan jî malbat wek naveroka jiyana danîne. Ji bona vê yekê wek di teşeya jiyana kevneşopî de jî rolekî wan hebû. Wan paşrayên xwe ji bona aborî, xweparastin, dijî xwewundakirin û hwd. bandor kirin.

Newşa karker ya Kurd bi newşa yekemîn ya Tirkan re jiyana xwe di karên giran, yê bedenî, nexweş û levitî de derbaskirin. Wan mirovan ev kar dikirin yê ku Elmanan nedikir (bnr. Wallraf 1985; Kizilhan 1995; Abadan-Unat 2002). Wan dirav didan hev, lê hem bedenî hem jî giyanî nexweş diketin (Schnapka 1986: 33). Rewşa mirovên xwe nezîkî civaka Elman dikin û takekesiya xwe diparêzin, ji yê ku bi malbatevê girêdayî an jî hevdana diravan wek naveroka jiyana xwe dibînin, nebaştir bû (Schnapka 1986: 33).

Bi gelemperî anko newşa yekemîn ya karker jiyana xwe di nêvegege teng de diburand, kasî zarokên xwe rastî „Jêcudakirina“ (Ausgrenzung) Elmanan nedihatîn (Abadan-Unat 2005: 217-218). Newşa yekemîn ji aliye Wiederkehr (1986: 33) ve wek mirovên ku di nivê çiyê de mane, hatiye şîrovekirin. Ne karin herin serê çiyê û wek civaka mezin jiyana bikin û ne jî karin wegerin binê çiyê û wek mirovên li welêt jiyana bikin. Hêjayê gotinê ye ku ramana newş û mijarên bi vê ve girêdayî, wek qutbuna newşan, kêşeya navnewşî û hwd. di serî de li cem newşa yekemîn ya karker de ru daye. Ji bona newşa yekemîn ya penaber ev mijar hê baş nehatiye têgihiştin.

Wek hatî gotin, bi gelemperî di malbatên herdu newşan de zarokên hem li welêt, hem jî li Elmanya hatine dinê, hene. Di dîroka koçberiyê ya di herdu newşan de dema zarokên wan gihana Elmanya, dest bi dibistanê kirin. Ev zarok di demek kurt de fêrî zimanê Elmanî bûn û newşên duyemîn yê pirçandî yê giyanmezin dest bi kar kirin. Yê biçûk dibistan berdewam kirin.

Wekî mirov baş dinêre, kare bêje ku di malbata newşa yekemîn ya karker de newşa duyemîn û di ya penaber de wan bi xwe kargeh wekirine. Di jiyana wan herdu cureyên newşan de mijara kar rolekî sereke lihîst. Entegrasyona wan mirovan gelemperî li ser rêya karkerî bûrî. Lê belê newşa yekemîn ya penaber, gelemperiyên wan di karên wusa yê wek newşa yekemîn ya karker, kar nekirin. Gelek ji wan, bi gelemperî yê xweyî pirzarok, tenê demek kurt di karên biyaniyan de kar kirin û piştre kargehên xwe vekirin. Anku zarokên wan pir bûn û alîkariyek mezin di nava malbat û xweyiyan de hebû, ji hev re bûne alîkarî û kargehên malbatî vekirin. Niha hêdî hêdî teslîmî newşa duyemîn dikin. Anko zarok pir bûn, pewistiya kargehên wan kêmbi karkerên din hebû. Ji bilî salên peşî de heta îro di kargehên xwe de kar dikin. Entegrasyona newşa yekemîn ya karker di ser „karkerî“ de û ya penaber di „karî“ de derbasbû. Ev cudatî di hinek xalan de taybetiyan derdixin holê. Wek mînak; ji bona vê yekê

malnişînî behtir li cem newşa yekemîn ya karker de heye an jî behtir li ser îdeolojiya çepî dirawestin. Lê belê wan herdu newşan jî kasî ku balê dan kar, wulkasî nedan xwendin, pêşketin, rewşenbîrî, nixx û binyadên civaka modern. Ji bona vê yekê pewist bû ku civata Kurd li benda newşa siyemîn bimêne.

Wek jêderkên çavdêr dayîn xwiyakirin, her çiqas piştî salên 1970yî guhertinek çebûbe jî, alîkarî di navbera newşa yekemîn ya karker û penaber de kême. Lê belê têkilî di navbera zarokên wan de hatiye danîn. Zarokên newşa yekemîn ya penaber, zarok û neviyên newşa yekemîn ya karker rekulturê dikan, wan fêrî zimên û nasnameya Kurdî dikan. Yanî newşên penaber, ya karker û zarokên wan politîze dikan.

Wek hatî gotin, newşa yekemîn ya karker behtir xweyî malnişînî ye û ev xalek muhîm e. Her çiqas ev newş tene bimêne jî, bi alîkariya malnişî rewşek rehet dibûre. Newşa penaber hêdî hêdî hevî dide bi dayîna dirava malnişîna xwe çebike. Di vî warî de hinek qanun li Tirkî hatin guhertin. Di çarçoveya wan qanunên nu yê Tirkî de ev ferzenda wan heye ku malnişîniya xwe bi dayîna dirava bistênin. Wusa xwiya dike ku newşa penaber li ser neviyên xwe behtir bi hez in. Têkiliyên gelek mirovên ji newşa karker bi saziyên Tirkan re hene û yê penaber bi gelemperî an di nav saziyên Kurdan de ne, an jî xwe jî saziyan dur dixin. Newşa penaber jî yê karker behtir pirsgirek bi belge-name, naskirin, nasname û hwd. re kişandine. Têkiliyê newşa karker behtir bi welêt re heye. Newşa penaber behtir li ser ziman diraweste. Li gora zarokên penaber, zarok û neviyên karker behtir xweyî pirsgirekên takekesî, civakî, çandî û nasnameyî ne. Newşa penaber jî ya karker behtir zarok hene. Ol di jiyana herdu newşan de jî roleke grîng nalîze.

Wekî mirov herdu newşan di rewşa pêwendiyên bi pirsgireka Kurdan ve dide ber hev, wek Spohn (2002: 132) anî zimên, wusa xwiya dike: Newşa yekemîn ya karker berî destpêka şer di navbera dewleta Tirk û PKK'ê de hatine Elmanya. Di demên wan de pirsgireka Kurd li Tirkîyê wek tabu bû. Wan kesan gelek bûyerên şer, yê wek şevitandina gundan, rewşa awarte jiyana nekirin. Wan kesan pevajoya etnikîbûn (Ethnisierungsprozess) li welêt jiyana nekirin. Li Elmanya, piştî hatina newşa penaber di carekî de wek Kurd hatin dîtin û bêgav man rawestiyekî di mijara nasname û pirsgireka Kurd de bistênin. Ev mijar vê di xebatek din de bi berfirehî were guftûgokirin.

Newşa yekemîn ya karker serpêhatiyek taybet kişand. Jiyana wan hem di ekstremekî de bûrî. Bêgav bûn xwe di nav Tirkan de veşerin an jî xwe gelek caran bi nasnameya Tirkî pênas bikin. Gelek jî wan di nav Tirkan de behtir li ser ramana olî û di nav saziyên olî yê Tirkan de man. Wan mirovan behtir xwe karîbû di saziyên olî de biparêzin. Ev mirov di carekî de bêgav man, xwe wek Kurd bidin naskirin. Kesên nedixwestin, xwe wek Kurd bidin naskirin jî, derdora wan êdî ew weke Kurd dîtin. Ji aliyekî ve pirsgirekên civaka modern û ya kapîtalîst, ji aliyên din ve yê biyanîbûnê, ji aliyê din ve yê siyasî jiyana wan bandor kirin.

Wekî mirov newşa yekemîn û ya duyemîn çavdêr dike, kare hinek xalan bêne zimên, gelo hê newşên yekemîn di kîjan mijaran de xweyî bandor in? Hêjayê gotinê ye ku anko newşa penaber di warê nasname, çand, ziman û maf de şiyar û polîtîze bûne, ev xalên li jêr werin danîn, behtir ji bona newşa penaber in:

-Sozialîzasyon: Anko hê mal di nav hevde ye û endamên malbatê yê zevicî hê jî di derdora malbatê de ne, mirov karê bêje ku dêûbav di sozlaşiyona zarokan de he xweyî hezekî xurt in. Mirov kare vê mijare bi zanebûna zimanê Kurdî jî bibîne. Anko zarok karin zimanê Kurdî an Tirkî, Erebbî, Farsî biaxivin, ev dide xwiyakirin ku ev zarok bi newşên mezin re di tîkiliyê de ne. Zarokên di nav malê de, yê ku ne bi newşa yekemîn re jiyan dikin, Kurdiyan wan lawaz e. Di vê mijarê de pir emare hene ku didin xwiyakirin ku newşa yekemîn hê di mijara sozlaşiyonê de xurt e. Nurudana matrîlokalî jî, wek wê di gotarek din de were şîrovekirin, rola sozlaşiyona wan dide xwiyakirin.

-Çandekirina ji nu ve (Rekulturation): Anko bandora newşa yekemîn di ware sozlaşiyonê de xurt e, ev jî dibe sedem ku ev newş kare newşên nu di mijara rekulturasyonê de bibandor bike. Hebûna newşa yekemîn di malbatê de zimanê zikmakî çalak dike. Ji bilî zimên dawet, cejn û taziyeyan jî li gora adetên Kurdî berdewam dikin. Bi berdewamiya çanda Kurdî, cih û rolê newşa yekemîn jî ji nu dipejirîne. Newşa yekemîn hebûna xwe bi wan mijaran hercar, carek din diafirîne.

-Kevneşopîkirina ji nu ve (Retraditionalisierung): Ev mijar jî wek rekulturasyon muhîm e. Bi bandora newşa yekemîn çanda Kurdî ya kevneşopî xwe di diyasporayê de diparêze. Mijara di vî warî de ya herî xurt ya ru dide, mijara zewaca bi dotmam/pismama re ye.

-Berhevdana diravan: Wekî tê xwiyakirin, hêjî ev newş li ber xwe dide ku wek malxwê malê bimêne. Balkeş e ku ev newş heta jê te, semiyana malbatê di nav zarokan de par nake. Hê bi gelemperî malên heyî di destê bav de ye û li zarokên xwe belav nake. Ev jî di dêûbavan re dibe weke hezekî ku zarokên xwe li cem xwe û di bin bandora xwe de bihêlin. Wekî yek ji malê cuda bibe, xeter heye ku ji samana malê bêpar bibe.

-Entegrasyon: Çarçoveya entegrasyonê bi gelek xalan ve bi newşa yekemîn ve girêdayîye. Ev mijar sînoren akulturasyonê bandor dikin û bi vî alî cihê neşên nu di entegrasyona di nav civaka mezin de dipêjirînin. Ji aliyê din ve ev newş, entegrasyona newşên nu di nav civata xwe de jî bandor dikin. Bi hinek stratejiyên taybet bi ser dikevin ku zarokên wan di nav civatê de bimênin û bi gotina wan „wunda“ nabin.

-Parastina konteksta diyaspora: Newşa penaber aktorên diyaspora Kurd in. Ev rola wan ya herî girîng ya civakî û siyasî ye. Di saziyên diyaspora de çalak in û siyaseta Kurd dikin. Ji bona vê yekê ev mirovên siyasî, yê karker îdeolojîze dikin.

Lê belê prozes hinekî girîftîdir e. Ev bandora wan ya li jor hate nîşankirin, bi demê re hinekî di malê de wunda jî dibe, anko koçberiya penaberî berdewam dike, rola wan di civatê de çalak dimêne. Bi gelemperî ev newş argumenta nasnameya Kurd, yanî Kurdbûn, wek mijarek serek di jiyana xwe de tînin zimên. Lê belê xalek pir balkeş e ku ramana wan ya li ser nasnamê û cureyên nasnamê ya takekesî bi aliyekî fereh ve, ne runîştîye.

**Nerîna Zanyarên Tirk Li Ser Koçberên Kurd**

Di vir de nerîna zanyarên Tirk pir girîng e. Mijara koçberiya ji Tirkî ji aliyê zanyarên Tirk ve bi gelemperî bi nerîneke yekalî tê dîtin û lêkolînên wan bi gelemperî nerîna aliyê civaka Elmanî û ya kemnetewên din yê wek Suryanî, Alevî an Kurd nade xwiyakirin. Zanyarên perspektiva wan bi aliyekî wek „objektîf“ were dîtin wan herdu kutleyan bi navên van tînin zimen, lê belê şîrovekirineke cuda nakin û wan wek hev di heman mijaranda bikar tînin. Bahar Başer bi xebata xwe ya bi navê „Di diasporayê de kêşeya Tirk-Kurd“ ya ku sala 2013an ji çapxaneyê Iletîşim çap bûye, kare wek mînakê were dîtin. Wekî armanca xebatê lêkolînan bi rastî lidarxistina rewşa rast ya Kurdan be, pewist e, ev herdu kutle cuda werin lêkolînkirin, anko ne mijara koçberî, ne têgiştina koçberiyê, ne rewşa diaspora, ne mijara etnikîbûn an xurtkirina olî wek alternatîva nasnameya koçberiyê, ne pevajo ya entegrasyonê û hwd. di nav herdu gelan de wek hev e. Ev herdu kutle reaksiyon û têgihiştinê cuda didin xwiyakirin û xweyî rawesteke cuda ne. Ji bona vê yekê gelemperiyên wan lêkolînan, rastiye bi tewahî nadin xwiyakirin. Hem sererkên Tirk, konsolxane, hikûmet hem jî saziyên koçberên Tirk li Elmanya bi hev re îdeolojiyê „bindestî“ di nav koçberên Tirk yê li Elmanya ava kirine. Kesê baş li mijarê nenêrîne, vê bawer bike ku Elmanan Tirk bi zore anîne Elmanyayê, bi zorê li Elmanya hiştine, bi zorê danîne bikarkirin û Elmanan her demî bi ramanê dijîmintiyê li Tirkan nêrîne. Lê belê rewş ne wusa ye. Hejayê gotinê ye ku dijîmintiya biyaniyan di nav beşek civaka Elman de heye û ev mijar di şîroveyên goçberî de pir muhîm e. Lê belê nerîna lêkolînerên Tirk ferzendê nade ku ev mijar bi nerîneke rasyonel were guftûgokirin. Dijîmintiya Tirkan ji dijîmintiya biyaniyan tê û ne berêvajiyê wê. Anko gotûbêjên aliyê Tirkî tenê nerîna sererkên Tirkan tînin zimên û mirovên Tirk xwe li ser vê nerastiye dirawestînin. Ev helwest ji salên 1960'î ve di civaka Elman de hem koçberên Tirk wek kêşeyekî dirunêne, hem jî li Elmanya dijî-biyaniyê geş dîke. Sererk, sazî û zanyarên Tirk bi gelemperî hizr, tirs û hestên civaka Elman bi ramanê bêalî nabînin û mijarê wusa guftûgonakin. Di vê bingehê de, mixabin, bandoreke nerenî li civaka Elmanî dîkin. Lê belê anko wek hatî gotin, ramana zanyarên Tirk ne ramanê bêalî ye, li gora wan qaşo koçberiya Kurdan ya penaberî bandoreke nerenî li civaka Elman kiriye û ramana dijî-biyaniyan zêde kiriye (wek mînak bnr. Abadan-Unat 2002). Heta hijmara Kurdên penaber li Elmanya zêde bû, li Elmanya biyanî wek „pirsgirek“ ji mej ve hatibûn kodkirin. Bi dawîhatina dewleta Sowyet hijmara penaberan zêde bû û anko hijmara penaberên Kurd di heman demê de zêde bû, zanyarên wek Abadan-Unat, bandora penaberan ya li ser civaka Elman hatî kirin, bi penaberên Kurd ve girêdidin (Abadan-Unat 2002: 225). Hêjayê gotinê ye ku hemu koçberan zehmet kişandin. Lê belê pewist e, were gotin ku wan mirovan ev ne kişandine anko Tirk in, wan mirovan zehmet kişandin, anko koçber bûn, anko Tirkî wek dewlet bi Elmanya re ji bona jiyana wan mirovan tiştek nekir. Lê belê, ev rastî gelek caran ji aliyê sererk û zanyarên Tirkan ve naye dîtin û di vê mijarê de penaberên Kurd tînin îstrumentalîze kirin.

Wekî mirov mînaka Tirkan tîne ber çavê xwe, dibîne ku ferzendeke mezin ya Kurdan heye. Kurd



karin ji serpêhatiyên mînaka Tirkan fêr bibin ku heman xetayan nekin. Ji bona têtewger, raman û pewajoya mînaka Tirk wulkasî tiştên nerenî bi xwe ve kirin ku ti sudeyên mezin ji serpêhatiya koça Elmanya negirtin. Ji aliyekî ve koma koçber ya Tirkan koma herî mezin ya Elmanya ye, lê belê rewşa ew têde ne weke girbûna komê ye. Wek mînak, Tirkan hêjî ne pejirandiye ku Elman xweyiyên Elmanya ne, ne pejirandine ku wê li vî welatî bimrin. Tirkan hê tenegehiştine ku sedemên eş û kulên wan ne tene Elmanya ye. Heman demî Tirkî jî berbirsiyarê eş û derdên wan mirovan e.

### **Encam**

Îro koçberiya Kurd bi tevahiya mijarên xwe ve li benda lêkolînkirinê ye. Bi hijmar û hêzê xwe ve civata Kurd di Elmanya de hingî diçe mezin dibe û xwe wek aliyekî muxatabê „pirsgireka Kurd“ dibîne (bnr. Karatas 2018). Lê belê mijarên vê civatê yê siyasî, çandî, civakî, jiyancîhanî, aborî, tenduristî, giyanî û hwd. hê bi tevahî li cihê xwe ne. Di serde mijarên wek qutbûna newşan, avakirina jiyancîhanên nu, rewşa nasnameyî û hwd. nu ru didin û li benda çavdêrî û lêkolînan in. Mijara newş di nav civaka Kurd de nêvengeke bakîr e û li benda lêkolînkirin, guftûgokirin û şîrovekirinê ye.

Newşên yekemîn yê koçberên Kurd aktorên diaspora Kurd in. Hijmara wan mirovan ji tahmînên gelek kesan behtir e. Ev kes di civakên herî pêşketiyên cîhanê de jiyan dikin. Her çiqas pirsgirêkan wan hebin jî, li gora dewletên dabeşker behtir xweyî azadiyê ne. Di vê azadiyê de ev mirov karin, ne tenê diravan rêkin, lê karin raman, zanebûn, huner û çandê transport bikin. Lê belê wekî mirov dinêre, dibîne ku ji bilî diravan ji Elmanya û ji bilî bukan ji welêt pir tiştêkî din transport nakin.

Wê sê gotarên din li ser newşên yekemîn yê Kurd li Elmanya werin amadekirin û veşanekirin. Di van gotaran de pirsgirêkên newşên karker û yê siyasî, nurudanên çandî û nasnameya wan newşan werin gutûgokirin.

### **Çavkanî**

Abadan-Unat (2005): Migration ohne Ende: vom Gastarbeiter zum Eurotürken. Berlin: Edition Parabolis.

Abadan-Unat, Nermin (2002): Bitmeyen Göç. Konuk Isciliğten Ulus-Ötesi Yurttaşlığa. İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul.

- Al, Dr. Serhun (2016): Baris ve Catisma Arasinda: Türkiye ve Ortadogu´da Kürt Dünyasini Anlamlandirmak. Subat-Mayis 2016 Diyarbakir-Sanliurfa-Mardin-Erbil Saha Arastirmasi Raporu. [https://www.academia.edu/26090671/BARI%C5%9E\\_VE\\_%C3%87ATI%C5%9EMA\\_ARASINDA\\_T%C3%9CRK%C4%B0YE\\_VE\\_ORTADO%C4%9EUDA\\_K%C3%9CRT\\_D%C3%9CNYASINI\\_ANLAMLANDIRMAK](https://www.academia.edu/26090671/BARI%C5%9E_VE_%C3%87ATI%C5%9EMA_ARASINDA_T%C3%9CRK%C4%B0YE_VE_ORTADO%C4%9EUDA_K%C3%9CRT_D%C3%9CNYASINI_ANLAMLANDIRMAK)
- Alba, Richard & Nee, Vichtor (2004): „*Assimilation und Einwanderung in den USA*“. In: IMIS-Beiträge 23/2004. S. 21-39.
- Alinia, Minoo (2004): Die Grenzen der Diaspora: Geschlechtsspezifische Einflüsse auf die Bildung nationaler Identität in der kurdischen Diaspora. *Kurdologie* Band 6, Unrast Verlag, Münster.
- Alinia, Minoo (2007): Diaspora Mekanlari. Kürt kimlikleri ve aidiyet politikari. (Spaces of Diasporas. Kurdish identities, experiences of otherness and politics of belonging. Göteborg Schweden). Ingilizceden Ceviren: Fahriye Adsoy. Avesta Yay. Istanbul.
- Amman, Birgit (1997): „*Ethnische Identität am Beispiel kurdischer Migration in Europa*“. Borck, Carsten; Savelsberg, Eva; Hajo, Siamend (Hrsg.): *Ethnizität, Nationalismus, Religion und Politik in Kurdistan*. Münster. LIT, S. 217-238.
- Amman, Birgit (2001): Kurden in Europa. Ethnizität und Diaspora. *Kurdologie* Band 4. Münster Lit Verlag.
- Asadi, Awat (2007): *Der Kurdistan-Irak-Konflikt : der Weg zur Autonomie seit dem Ersten Weltkrieg*. Schiler Verlag, Berlin.
- Aumüller, Jutta (2009): *Assimilation. Kontroversen um ein migrationspolitisches Konzept*. Bielefeld: transcript Verlag.
- Aumüller, Jutta (2010): Wie viele Generation dauert Integration? Wie Begriffe unser Bild von Gesellschaft prägen. Heinrich Böll-Stiftung. Dossier: Dritte Generation, 2010. S.7-11. Direktlink: [http://www.migration-boell.de/web/integration/47\\_2679.asp](http://www.migration-boell.de/web/integration/47_2679.asp)
- Baser, Bahar (2013): *Diaspora´da Türk-Kürt Sorunu. Almanya ve İsveç´te İkinci Kusak Göçmenler*. İletisim Yay. Istanbul
- Bernart, Yvonne & Krapp, Stefanie (2005): *Das narrative Interview : ein Leitfaden zur rekonstruktiven Auswertung*. Landau: Verl. Empirische Pädagogik.
- Bock, Dr. Thomas (1986): *Entwurzelung und Leben in der Fremde*. Vortrag mit Prof. Dr. Jan Gross. In: *Migration und psychische Gesundheit* (1986). Fachtagung der Arbeiterwohlfahrt Bundesverband e. V. und der Deutschen Gesellschaft für Soziale Psychiatrie e. V. vom 1. bis 3. November 1985 in Bonn. Bonn. S. 18-22.

- Bpb (1.4.2018): Ausländische Bevölkerung nach Staatsangehörigkeit. In absoluten Zahlen, durchschnittliche Aufenthaltsdauer in Jahren, 31.12.2016.  
<http://www.bpb.de/nachschlagen/zahlen-und-fakten/soziale-situation-in-deutschland/61631/staatsangehoerigkeit>
- Bpb (4.4.2018): Bevölkerung mit Migrationshintergrund I. In absoluten Zahlen, Anteile an der Gesamtbevölkerung in Prozent, 2016 (4.4.2018 veröffentlicht).  
[http://www.bpb.de/wissen/NY3SWU,0,0,Bev%F6lkerung\\_mit\\_Migrationshintergrund\\_I.html](http://www.bpb.de/wissen/NY3SWU,0,0,Bev%F6lkerung_mit_Migrationshintergrund_I.html)
- Bracker, Philip (2017): Die Entstehung ethnischer Identität bei 'Menschen mit türkischem Migrationshintergrund'. Münster, Waxmann.
- Bredtmann, Julana (2011): „Von Sèvres zur PKK – Ein historischer Überblick über den türkisch-kurdischen Konflikt“, In: Kurdistan im Wandel: Konflikte, Staatlichkeit, Gesellschaft und Religion zwischen Nahem Osten und Diaspora. Frankfurt am Main, Berlin, Bern, Bruxelles, New York, Oxford, Wien, 2011. S. 78-87.
- Dorsch, Friedrich (1970): Psychologisches Wörterbuch. Felix meiner Verlag, Hamburg.
- Eliassi, Barzo (2012): Ülkeimde Bir Yabancı. İsveç'teki Kürt Gençlerinin Adiyet Politikaları. Avesta Yay. Istanbul.
- Elwert, Georg (1982): „Probleme der Ausländerintegration. Gesellschaftliche Integration durch Binnenintegration?“, in: Kölner Zeitschrift für Soziologie und Sozialpsychologie, 34(4), 717-731.
- Endruweit, Günter & Trommsdorff, Gisela (1989): Wörterbuch der Soziologie. Dtv/Enke, Stuttgart.
- Esser, Hartmut (2004): Welche Alternativen zur 'Assimilation' gibt es eigentlich. In: IMIS-Beiträge 23/2004. S.41-59
- Firat, Derya (2003) : Giris. Toplumbilim, Gök Sosyolojisi Özel Sayisi sayi 17 Ekim 2003 s. 7-14
- Grote, Maik (2011): Integration von Zuwanderern: Die Assimilationstheorie von Hartmut Esser und die Multikulturalismustheorie von Seyla Benhabib im Vergleich. Migremus Arbeitspapiere Nr 2/2011, Uni-Bremen
- Heckmann, Friedrich (1992): Ethnische Minderheiten, Volk und Nation: Soziologie inter-ethnischer Beziehungen. Stuttgart, Enke.

- Holz, Gerd & Scheib, Hermann & Altung, Sükriye & Petereit, Ute & Schürkes, Jutta (1994): „Fremdsein, Altwerden, und was dann? – Ältere Migranten und die Altenhilfe“. ISS-Eigenverlag, Frankfurt a.M.
- Izady, Mehrdad R. (2011): Kürtler, Bir El Kitabî. Doz Yay. Istanbul. Ingilizceden Ceviren Cemal Atilla.)
- Jelpke, Ulla; Buchholz, Christine; Höger, Inge (2011): auf die Kleine Anfrage der Abgeordneten Ulla Jelpke, Christine Buchholz, Inge Höger und der Fraktion DIE LINKE. – Drucksache 17/4727. Deutscher Bundestag, Drucksache 17/4937. 17. Wahlperiode 28.02.2011.
- Karataş, Avdo (2018): Di Nav Kurdên Diyasporayê De Kêşeya Navnewşî: Mînaka Elmanyayê. *International Journal of Kurdish Studies (IJOKS)* 4 (1), 155 – 175.
- Kesen, Nebi (2009): Die Kurdenfrage im Kontext des Beitritts der Türkei zur Europäischen Union. Baden-Baden: Nomos. (Zugl.: Zürich, Univ., Diss., 2009).
- Khayati, Khalid (2009): Mağdur Diasporadan Sınır-Ötesi Vatandaşlığa mı? Fransa ve İsveç'teki Kürtlerde Diasporanın Oluşumu ve Ulus-Ötesi İlişkiler. Avesta Yay. Istanbul.
- Kizilhan, Ilhan (1995): Der Sturz Nach Oben. Kurden in Deutschland. Eine psychologische Studie. YEK-KOM (Hg.) Verlag medico international, Frankfurt, 1995
- Kizilhan, Jan (2013): „Integration kurdischer MigrantInnen in Deutschland – Herausforderungen und Chancen“, Vortrag von Prof. Kizilhan an der Fachtagung „Integrationspolitik aktiv gestalten“, 23 September 2013, DGB-Gewerkschaftshaus, Stuttgart.
- Krämer, Alexander & Baune, Bernhard Th. (2004): Migrationen: eine Herausforderung für die Gesundheitswissenschaften und die gesundheitliche Versorgung. In: Krämer, Alexander & Baune, Luise (Hrsg) (2004): Gesundheit von Migranten. Internationale Bestandaufnahme und Perspektive. Juventa Verlag, Weinheim und München. S.9-20
- Kurthen, Hermann (2002): „Einwandererintegration im Spiegel der U.S. Amerikanischen Forschung.“ Immigrant Integration in U.S. American Research. In: Wohlfahrtstaat, Einwanderung und Ethnische Minderheiten, Hrsg von Andresa Treichler. Opladen, Westdeutscher Verlag pp. 83-106
- Lajos, Konstantin (Hrsg.) (1991): Die zweite und dritte Ausländergeneration. Ihre Situation und Zukunft in der Bundesrepublik Deutschland. Leske + Budrich, Opladen.

- Mayring, Philipp (1990): Einführung in die qualitative Sozialforschung. Eine Anleitung zu qualitativem Denken. München: Psychologie Verlags Union.
- Mayring, Philipp (2015): Qualitative Inhaltsanalyse. Grundlagen und Techniken. Weinheim und Basel, Beltz Verlag.
- McDowall, David (2004): Modern Kürt Tarihi. Doruk Yay. Ankara.
- Mead, Margaret, (1971): Der Konflikt der Generationen. Jugend ohne Vorbild. Walter-Verlag AO Olten.
- Mönch, Ronald (1994): Autonomie oder Eigenstaatlichkeit. In: Heidi Hinz-Karadeniz & Rainer Stoodt (Hrsg.). Kurdistan: politische Perspektive in einem geteilten Land. Giessen: Focus, S. 186-202
- Pressemitteilung (12.04.2018): Pressemitteilung Nr. 133 vom 12.04.2018: Ausländische Bevölkerung wächst im Jahr 2017 um 5,8 %. [https://www.destatis.de/DE/PresseService/Presse/Pressemitteilungen/2018/04/PD18\\_133\\_12521.html](https://www.destatis.de/DE/PresseService/Presse/Pressemitteilungen/2018/04/PD18_133_12521.html)
- Salih, Azad (2004): Freies Kurdistan. Die Schutzzone der Kurden in Irak-Kurdistan. Dissertation in Freie Universität Berlin Fachbereich: Politik- und Sozialwissenschaften. Gutachter: Professor Dr. Friedemann Büttner und Professor Dr. Hajo Funke. Datum der Promotion: 28.10.2004. Berlin [http://www.diss.fu-berlin.de/diss/servlets/MCRFileNodeServlet/FUDISS\\_derivate\\_000000001392/0\\_Salih-neu.pdf](http://www.diss.fu-berlin.de/diss/servlets/MCRFileNodeServlet/FUDISS_derivate_000000001392/0_Salih-neu.pdf)
- Schnapka, Markus (1986): Bericht Arbeitsgruppe 2. In: Migration und psychische Gesundheit (1986). Fachtagung der Arbeiterwohlfahrt Bundesverband e. V. und der Deutschen Gesellschaft für Soziale Psychiatrie e. V. vom 1. bis 3. November 1985 in Bonn. Bonn. S.33-34
- Schroeder, Christoph (2003: 24): Der Türkischunterricht in Deutschland und seine Sprache(n). In: Zeitschrift für Fremdsprachenforschung 14 (1), S. 23-39.
- Skubusch, Sabine (2002): Kurdische Migration und deutsche (Bildungs-)Politik. Unrast Verlag, Münster.
- Spohn, Margret (2002): Türkische Männer in Deutschland: Familie und Identität. Transcript, Bielefeld.
- Van Bruinessen (2003): Aga, Seyh, Devlet. Iletisim Yay. Istanbul)
- Vanly, Ismet Cherif (1986): Kurdistan und die Kurden. Band 2. Pogrom Taschenbücher. Kassel
- Wallraf, Günter (1985): Ganz unten. Kiepenheuer & Witsch Verlag, Köln.

Wiederkehr, Peter (1986): Psychosoziale Probleme der ersten Generation. In: Migration und psychische Gesundheit (1986). Fachtagung der Arbeiterwohlfahrt Bundesverband e. V. und der Deutschen Gesellschaft für Soziale Psychiatrie e. V. vom 1. bis 3. November 1985 in Bonn. Bonn. S.32-33